

# BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊD



## NAVEROK

Daxwuyaniya Berbangê .....	2
Bî tiliya Balyozxana Tirk lî dij Kurdan kampanyek nû.....	3
Lî Swêdê perwerde û Hindekariya kurdi.....	4-5-6
Faşizm û rewşa Jînan .....	7-8
Bersiva Çend Pîrsan.....	8
Rexne .....	9-10
Keyqubadê Kurd.....	11
Çend Gotin lî Ser Zerdeşt 12-13-14	
Jî KURDISTANÊ NÛÇE û BÛYER.....	15-16
Perwerda nijadperesti.....	16
Serpêhatiyên Kalo.....	17-18
Dewleta Polis.....	19
Jî Federasyonê û Komelên endam Nûçe û şrove.....	20-21
Hilbijartina Îsali.....	22-23

## BERPÎRSIYAR :

A : TÎGRÎS

## REDAKSIYON :

BAVÊ NAZÊ

S. QERECDAŞ

C. ŞERO

MUÛYED TEYIB

BRÎNDAR

## PERGALA RÛPELAN

COTKAR Û GUNDÎ

## BERBANG

*Kovara Kurdi, Xwedî : Federasyonê Komelên Kurdistanê li Swêd. Buha : 5 Kron, Abona salekê: 60 Kron, 30 DM.*

## NAVNIŞAN

Berbang, Rissneleden 55, NB  
172 44 SUNDBYBERG/SWEDEN  
Tel: 08/984553  
Postgiro 64 38 80-8

## JI XWENDEVANAN RE!

Geli xwendevanên hêja!

Redaksiyona me, ji bo Berbangê hin baştir û pêşkêti, kampanyeke pîr alî vekir.

Jî vê kampanya pîr, alî xala (nuxta) yekem, Kîryariya (abona) Berbangê ya salewextî ye. Redaksiyona me, bîyar da, ku berî her kesî endamê redaksiyonê jî Berbangê re bîbin kîryarevan. Û di sa redaksiyonê, ev bîyara xwe ya ha bî Komîta Karger a Federasyonê. Komîta Karger a Federasyonê, pêşniyariya redaksiyonê qebûl kir. Em dixwazî vê pêşniyariya xwe bîbin komîta çavdêr, komîta nûnerên û komîteyên komeleyên endamê Federasyonê. Û em bî rîya Berbangê vê pêşniyariya xwe ya jî bo kîryariya berbangê, jî we hemû xwendevanên xwe re jî pêşkêş dikî. Em benda endametiya kîryariya we ne!

Xala kampanya me ya duyem, berhevkirîna navnişanên Adresên) xwendevanan e. Ev xala kampanya yê jî xala kîryariya Berbangê cûdatir e. Kesên ku kîryariya xwe ya salewextî neşeyne jî, di sa em jî wan re bê pere Berbangê dişînin. Lê, navnişanên kurdên ku lî Swêdê dijin, di destên me de pîr kê mî. Navnişanên hinek kesan ha me hene, lê gava em, lî ser wan navnişanan Berbangê bî rê dikî, paşve jî me ra tîn. Jî ber ku navnişanên wan kesan hatîne guhartî. Yê wan yê nu jî, lî ba nî in. Bî rasti çapkirî û weşandîna kovarek jî her alî ve ne hêsa ye. Heger kovar bî şêweke gelemperî (gîştî) di nav xwendevanan de belav ne be, armanc û hêjabûna wê namîne. Loma redaksiyona me, bî kêmtirîna kampanyeke jî bo berhevkirîna 1000 navnişanî daye pêşîya xwe. Di vê wari de tîka me, jî hemû komeleyên endam, rêxistinên kurdan û kesên kurd yê wêlatparêz ev e, ku jî me re navnişanan bîrê kî.

Me, di hêla alîkariya nivîsar, helbest û wênan de jî kampanyeke vekirî ye. Daxwaza me, ev e, ku kovar jî hêla naverok û form de jî, hin baş û qelîta wê hêja bibe. Ev jî, girêdayîya nivîskar, helbestvan û wênekêşên kurd e, ku jî kovarê re alîkariya bîkî.

Em di vê kampanya xwe ya pîr alî de hewcedarê alîkariya we ya pîr alî ne. Bî sîlavên welatevîni!

BERBANG

# bı tiliya balyozxana tirk LI DIJ KURDAN KAMPANYEK NŪ

A. TİGRİS

Ev çend hefte ne, ku hinek rojname, radyo û televizyona Swêdê, li dij doz û tekoşina kurdan a netewî û civaki kampanyeke dijwar vekirî ne. Bı şêweki (şekleki) vekirî, bı tili û direktifa balyozxana (konsolosxana) Tirk a li Swêdê, serê vê kampanya ha rojnama Svenska Dag Bladet dîkşine. Ev rojnama swêdî, rojnama sermayedarên (monopolên) Swêd yê herî mezin e. Rojnameke rast (sağ) û tari ye. Nêzi partiya Moderat e. Rojname, bı politika xwe ya weşani li dij biyaniyan e. Dî gelek weşanên xwe yê rojane de li dij biyaniyan nivisaran dîweşine. Bı taybeti dî vê rojnama ha de bı navê Sune Olofson rojnamevenek heye.. Li dij kurdan dî vê rojname de çî bê nivisandin, hemû ji destê vi kesi derdikeve. Dî van salên dawî de piraniya nivisarên ku li ser kurdan derfê, wi kesi nivisandiyê.. Kesekî tari û li dij kurdan e.

Disa ev rojnamevan, bı meha tebaxê re dest bı nivisarên xwe kir û li dij doza gelê Kurd nivisand. Wi hêj ci çêdikirin û bala xwendevanên xwe dîkşandin ser vê meselê. Ew rojnamevan, hefteke paşê ji dî rûpela Svenska Dag Bladet a pêşin de bı tipên (herfên) gır "Teroristên kur-

dan Biryara kuştina Palme Da!" nivisand. Domahika nivisarê dî rûpelên hundir de, ji niv rûpeli zêdetir dıgirt. Rojnamevan dî nivisara xwe dıgotin, ku " sekreterê PKK ê Abdullah Öcalan, ser li dewleta Swêdê xistiye, ku wi, wekî tengezareki (multeciyeke) politik qebûl bîkin. Lê, dewlet û hukmeta Swêdê serlêdana Öcalan qebûl ne kiriye. Ji ber vê sedemi ji, PKK, biryar daye, ku Serokwezirê Hukmeta Swêdê O. Palme bukje." Li gor nivisandina rojnamevan, wi, vê agahdariyê ji SÄPO (MÎT a) Swêdê girtiye. Ev nivisara Svenska Dag Bladet awira gelemperiya (raya giştîya) Swêdê tev li hev kir. Li pey vê nivisarê hema hema hemû rojnameyên Swêdî yê herî mezin vê babetê girtin û bı tipên mezin dî rûpelên xwe yê yekemin de weşandin. Ū hemû rojnaman Svenska Dag Bladet serkani şandan. Radyo û televizyonê ji çend roj li ser hev nûçeyên vê bûyera ha dan.

Rojnama Svenska Dag bladet vê bû-

yera ha bı zanyari derxist . Çend sedemên wê hene:

Sedemek jê ev e, ku li Swêdê hilbijartina giştî nêzde tê pêk anin. Ev rojname bı "teroristiya kurdan" li dij biyaniyan propagandayê dîxwaze geş bike. Ji lew re piraniya gelê Swêdê ji Palme hez dîke. Rojname û rojnamevan dîxwazın bı vê propagandaya derewin gelê Svêdê bîkan dîjminê Kurd û hemû biyaniyan. Sedemeke dîn ya herî gring ji, têkiliyên rojname paşverû û rojnamevanê wê Sune bı balyozxana Tirk a li Swêdê re hene.

Li ser vê rewşa ha ya negatîf, Komita Karger a Federasyon a Komelên Kurdistanê, civin çêkir û li ser rewşê sekini. Komite biryar da, ku ji Komita Karger 3 kes, dê herin bı berpirsiyar û rojnamevanan re bipeyvin û rewşê bîdın diyarkirin. Ū çewti û şaşiyên wan ji wan re bêjin û divê dî rojnameyên xwe, çewti û şaşiyên xwe cardin bı nivisandinê rast bîkin. Her sê endamên Komita Karger a Federasyona Komelên Kurdistanê bı hev re çûn rojnama Svenska Dag Bladet û bı rojnamevan Sune Olofson re civinek pêk anin. Hevalên Komite, bı zîmaki nerm û şêrin bûyerê (meselê) vekirin û bı kurtayi van tiştana, ji rojnamevan re gotin:

" Em ji Federasyona Komelên Kurdistanê tîn. Tu bû çend care, ku li ser kurdan, dî rojnama Svenska Dag Bladet de nîvis dînvîsi. Rojnama we li gor xwe, rojnameke mezin û ciddî ye. Bı hezaran xwendevanên wê hene. Te çend roj berê " Kurdên terorist biryara kuştina Palme dan" dî rojnama Svenska Dag Bladet de nivisandî bû. Wek tu bı xwe ji baş dizani kurd ne terorist in. Doza me Kurdan mezin û gring e. Em Kurd li çar perçan ji bo stendina mafên xwe tekoşina netewî didin. Dî du perçên Kurdistanê de bı salan ne, ku ne tewê me şerê çekdariyê didomine. Em neteweke bîndestın çawa tu me terorist şandidî? Gelê Swêdê li humber tekoşina kurdan pozitif e. Tu bı vê nivisara xwe dî derheqê kurdan de li ser ditin û tewrê gelê Swêdê negatîf tesir daki. Bı nivisarên te, rewş û tewrên swêdiyan dî elehiya me de hat guhartin. Pêwestiya netewe yê kurd bı alikari û piştgiriya gelê Swêdê û cihanê heye. Te bı zanin an ji bı nezani bı van nivisarên xwe, bı taybeti bı nivisara xwe ya

dawî derbe li tekoşina neteweyê me xist. Ew tiştên ku te nivisand, ji cunta Tirk re bı kêr hat. Cunta û dewleta wê ji xwe hebûna kurdan nasnake û ji kurdan re dibêje terorist û parvekar. "

Rojnamevan, xwest ji me gelek tiştan pirske û bı taybeti dî derheqê PKK ê de bı me re bîkeve polemikan. Lê, me rê nede pirs û polemikên wi. Ū me bı kurti wiha jê re got:

"Rast e ferqa me û PKK ê heye. Ger tuneban, em dê bı hev re bixebitîyan. Ev geişa me Kurdan e, ne yê we ye. Loma em naxwazın vê babetê vekin û munaqeşe bîkin. Lê ew tiştên ku te nivisandiyê dawa kurdan a tevi ye. Swêdî kurdan nas dîkan, ne hereketên kurdan. Te, serên swêdiyan tevlêhev kir. Em, li ser navê Federasyona Komelên Kurdistanê, dîxwazın tu, şaşî û çewtiyên xwe , bı nivisareke dîn rast biki."

Li derketinê, me her sêyan carek dîn ji S. Olofson rîca kir:

" Heger tu dî vi wari de bînvîsi, ditin û gotinê me bînvise, yê n xwe ji me re tu neki mal."

Li ber asansorê (hissê) S.Olofson ji me pirsî:

— Hun mister Senaynas dikim?

Hevalek got:

—Na, ew ki ye?

— Memûrê Balyozxana Tirk e. Li ser vê nivisara min a dawî, ji min re telefon kir û min piroz kir. Nivisara min gelek ecibandi ye. Roja duşemê ji, ez vexwendiyê wi me.

Hevalê veğerand:

—Lê, me berê ji te re got, ew tiştê ku tu dî derheqê Kurdan de dînvîsi kêrê cunta ya Tirk tê.

Dî roja yekşemê 11 meha tebaxê de dî derheqê hevdişina me de, bı navê Sunne Olsson disa dî Svenska Dag Bladet de nîvisarek bı fotografên du hevan ve derket. Bı rasti ew tiştên ku wi nivisandî bû, têkiliyên wan û axaftina me dî sedi de heştê qet bı hev tune bûn. Rojnamevanê paşverû, disa li gor birûbaweriya xwe û bı eqilmendi û direktifa Mister Saray nivisandî bû

Komita Federasyonê li ser vê rewşê cardin civiya.. Komitê, tekzip û protestokî ji rojname û rojnamevan re şand.

# LI SWÊDÊ PERWERDE Û HÎNDEKARIYA KURDÎ

Z. REXNEGIR

Li Swêdê, sala perwerde û hindekariya 1985-1986 an di roja 19 ê meha 8 an de destpêdike. Piraniya dibistanên Swêd di vê rojê de vedibin. Îsal, bi kêmasî qasî 500 kes zarokên Kurd jî, li Swêdê di dibistanan de dikevin nav xebata perwerde û hindekariyê.

Ez, dixwazim di vê nivîsara xwe de li ser sistema perwerde û hindekariya Dewleta Swêd ya ku jî bo zarokên biyaniyan bi kar tîne û bi taybetî li ser rewşa şagirtên (xweddekarên) Kurd yê n ku li Swêdê di dibistanan rawestim û di derheqê rewşa wan de, xwendevanan piçek agahdar û serwest bînim.

Di 1960-65 an de ekonomîya Swêd, gelek pêşve diçû û karkerên wan jî wan re têr û kêr ne dahat. Swêd, wek hûnek dewletên din yê n Ewropayê jî derê welat pêwestiya karker û teknîsyenan dit. di van salana de bi gelek dewletan re peymanên karker girtinê pêk ani. Di nav wan dewletên bêkar û karker zêde de Finlandiya, Yewnanistan, Yugoslavya û Tirkîyê dihatin. Jî van welatan bi hezaran karker bi riyên fermî (resmî) hatin Swêdê.

Jî bil hatina wan karkeran, jî aliyek din de jî, jî welatên diktator û bindest jî, bi sedan û hezaran kes jî ber ditin û birûbaweriyên xwe yê n politik û olî (dînî) jî welatên xwe tengezar bûn û hatin Swêd bûn tengezarên (muhacirên) politik. Wisa bû, ku iro jî 8 milyon rûniştvanên (nufûsa) Swêd, milyonek biyani ne. Ango bi zîmanekî din li Swêdê, jî 8 kesên yek biyani ne.



Hatina Kurdan li Swêdê piştî 1970 yî destpêdike. Beriya vê mêjîyê, Kurd li Swêdê gelek kê m bûn. Mîrov kare bi hêsayî bêje, ku çend karker an jî çend xwendekar bûn. Di navbera 1971-1972 yan de çend kurdên politik jî Kurdîstana Bakûr (Kurdîstana Tirkîyê) û piştî 1975 an jî, jî Kurdîstana Başûr grûbek Kurd hat Swêd. Li Swêdê bi ci bûn. Bi gelemperî hatina Kurdan li Swêdê, di sala 1980 yî de çaxa ku cunta Tirk a faşîst dest da ser karîne destpêkir. Li gor agahdariyên sazgehên (meqamên) Swêd, iro qasî 6000 kes Kurd li Swêdê dijîn. Û roj bi roj jî hejmara Kurdan li Swêdê zêde dibe. Jî welat tengezari domdike.

## WELATÊ TEV LI HEV

Civaka Swêd, bû civakeke xelt. Wek nok, nisk, genim, ceh û gilgîl

li nav hev keve. Porreş, porzer û porkej li nav hev ketin... Zîman, kultur, ol û tore tevlihev bûn. Û wîha li Swêdê civakên biçûk û mezûn yê n cûrbe cûr pêkhatin. Bi hatina biyaniyan re gelek problemên wan jî hatin û yê n nuh çêbûn. Problemên herî mezûn û girîng di hêla zîman, kultur, ol û tore de derketin. Jî bo pêşketina civaka Swêd û yê n biyaniyan, jî bo têkiliyên zexm û germ ku navbera swêdî û biyaniyan de zêde bibe û jî bo biyani jî welat, kultur û jî zîmanên xwe dîr nekevin û jî birnekin; Dewleta Swêd, li ser civakên biyani lêkolîn û lêgerin da çêkîrîn. Grûbên lêkolîn û lêgerinan di derheqê civakên biyaniyan de raporên xwe raberên sazgehên Swêdî kîrîn. Di sala 1977 an de parlamentoya Swêd, "Zagona Reformê ya Zîman" pejirand. Li gor vê zagona perwerde ya 1977 an her biyaniyê ku bixwa-

ze zarokên wi/wê li dibistanê bi zimanê xwe bixwine û binvîsine, komin (belediye) û dibistan pêwest' in, ku ji wi/wê şagirti re mamosteyê bi zimanê wi/wê bibine. Ew zagona perwerde û hindekariya 1977 an heta iro bi du (2) cûran hatiye pêkanin:

Cûra yekem an ji grûba yekem ji bo civakên biyaniyên mezin ku li taxek an ji navçek dijîn re pêk tê. Ger di taxek an ji di navçek de ji eyni grûba biyani û eyni zimani zarok pîr bin û bav û diyên wan ji bixwazin; swêdi li wêderê çina (sîfî) bi zimanê wan ya serbixwe vedikin. Ew çin ew çax bi seran ser dibe ya wi zimani. Mamoste, pirtûk û hemû metaryalên perwerdekariya wi zimani, ji aliyê komin û dibistanê ve têne tevdil û tekûzkirin. Şagirtin wê çina serbixwe ançax di rojê de çend saet karin herin kursa zimanê swêdi. Wek din hemû cûren dersan bi zimanê xwe dibinin. Ev çinên wiha yê ziman ji çina yekê heta ya şeşan dom dike. Şagirt ji çina şeşan pê de pêwîst e ku here çina swêdi. Lê disa, di vê demê de an go di çina swêdi de ji mafê her şagirti heye, ku perwerda zimanê xwe bide domandin. Ev maf heta dawiya lîsê (gymnasiumê) dom dike. Îro li Swêdê ew civakên biyani yê ku zarokên wan di vê grûbê de diçin dibistanê û bi zimanê xwe di çinên serbixwe de perwerde dibinin ev in:

Fini, Yewnani, Yugoslavi, li hinek ciyan Suryani/Asuri û Tirk.

Li Swêdê, perwerdekariya zimanê zikmakiya cûr a duyemin ji, çinên serbixwe nin in. Ev cûra ha ji bo grûbên biyani yê biçûk tê bi kar anin an ji, grûbên ku li Swêdê belav bi ci bûne. Çend kes li taxek an ji li bajareki ye ji bo wan çinên serbixwe ne mumkun e. Ew zarokên biyani yê ku li wan tax û hereman dijîn diçin çin û dibistanên swêdi. Bi swêdi dixwinin. Lê, mafê wan yê bi zimanê xwe perwerde û hindekariyê ji heye. Disa ev yek girêdayiyê xwestina dê û bavên wan in. Ger dêûbav daxwaz bikin, mafê zarokên wan heye, ku

di heftê de 2-4 saet bi zimanê xwe ji bixwinin. Li gor rewşa zarokan hejmara van saetan kare bê guhartin. Îro li Swêdê, zarokên Kurdan ji, di nav vê grûba perwerdekariya ha de ne. Kurd, niha li Swêdê li bajarê Stockholmê, Uppsalê, Goteborgê, Lundê, Karlstadê û li Eskistunnayê dijîn. Li derê van bajarên ji Kurd, li tevayiya Swêdê belav bûne. Lê hejmarên Kurdan li derê din gelek kê m in.

Mixabin, statistikên berçav û rast di dest de nin in; lê li gor texmînan li Swêdê, qasi 500 zarokên Kurd yê ku diçin dibistanan hene. Lê, disa hezar bixabîn ev zarok hemû bi zimanê xwe di heftê çend ders be ji perwerde û hindekariyê nabinin! — Ez dê li pêş li ser vê babetê rawestim. — Ji nêvi kêmtir diçin perwerdekariya zimanê kurdi.

Ji derê van herdu cûran, swêdiya ji bo zarokên biyaniyan hinek imkanên din ji çêkirine. Wek dibistanên roja şemiyê. Li taxên ku biyani li wir dijîn dibistanên rojê şemiyên vekirine. Her grûbên biyani di dibistanên roja şemiyê de bi zimanê xwe karin 4-5 saet perwerde û hindekariyê bibinin. Dibistanên roja şemiyê bi programên xwe, serbixwe ne. Mesrefa wan ji disa girêdayiyê kominan in. Ji sê (3) salan vir de ye, ku li bajarê Stockholmê li taxa Tenstayê zarokên kurdan ji, her rojê şemiyê diçin dibistana Rojaşemiyê. Di termina (somesra) bori de 49 zarokên Kurd, ji taxên Stockholmê yê cûrbe cûr dihatin dibistana Rojaşemiyê. Di dibistana Rojaşemiyê beşa kurdi de 3 mamoste dixebitiyan. Di vê dibistanê de dersên ziman, dirok, cografya, muzik û folklorê kurdi tê dayin. Şagirtên dibistanê gelek şev û şayi pêkanin. Di pêşengiya Şivan de kasetek stran tije kirin û belav kirin. Îsal bi vekirina dibistanan re dê dibistana Rojaşemiyê ji, dest bi xebata xwe bike.

Parlamentoya Swêd di gulana 1985 an de "zagona perwerda 1977" an di çav de derbas kir. Parlamentoyê biryar girt, ku imka-

nên perwerda biyaniya kê m bike. Dixwazin çinên zimanên serbixwe bigrin. Grûba duyemin bi tenê bi kar binin. Û pê re pê re perwerda biyani ji dibistanên swêdi rakin û dibistanên Rojaşemiyê pêşve bibin û xurt bikin.

Par (sala bori) di tevayiya Swêd de 17 mamosteyên zimanê kurdi di dibistanan de vatini (wezife) girti bûn. Xweza yê ku di heftê de çend saet dixebitiyan li derê wan in. Bi kêmasi hewqas mamostên kurdi ji, di zarokxanan (daghem-kreş, fritidssan) de, di dibistan û kursên zimanê swêdi de, ji kesên kurdi yê mezin (gewre) yê ku ji nû ve fêrê xwendin û nivîsandinê dibûn re wek alikar û werger ci girtin û xebitin.

Di 1984-1985 an de li zanîngeha (universita) Stockholmê beşa memostetiya kurdi vebû. Îsal, dike du (2) sal in, ku 9 kes mamostên berendam di vê beşa ha de dixwinin. Ew beşa ha, dê îsal ji çend kes ji bo mamostetiye şagirt bigre.

### PIRTÛK Û METARYALÊN KURDÎ BI TÊR U KÊR NAYEN

Wek hemû kurdi pê dizanin, derê Kurdistanê Başûr (Kurdistanê Iraqê) ji xwe li beşên din kurdi nivîsandin û xwendin qedexeyê. Pirtûk û metaryalên dibistanan nin in. Yê ku iro li Kurdistanê Başûr ji hene, propaganda û fortên rejîma Baas dikin. Derê Swêd, li welatên Ewropa yê din ji, imkanên perwerde û hindekariya kurdi nin e. Li Swêdê heta iro gelek pirtûk, rojname û kovarên kurdi hatin weşandin û hinek ji wan jiyan xwe hêj ji didominin. Mirov dikare bêje, ku pîraniya wan afirandinan ji yê zarokan in. Lê hezar mixabin mirov nikare wan pirtûkan wek dixwaze di şûna metaryalên dibistanê de bi kar bine. Hinek ji wan pirtûk û kovaran ji bo zarokên biçûk in; yê ku naçin dibistanê. Di vê babetê de ew zarokên biçûk yê ku li Swêdê dijîn gelek bi şans in. Li Swêdê çend pirtûkên çirok û xebroşkên gelêri

ji aliyê M. Emin Borzaslan ve hatin berhevkirin û çapkirin.

ji bo zarokên biçûk, ji swêdi çend pirtûkên çirokanên bi nav û dend bi kurdi hatine wergerandin. Lî Swêd hinek pirtûk ji, ji bo kesên gewre (mezim) in. Ew ji, ji şagirtên dibistanê re nabin. Ji aliyê pedagojik û metod ve kevin in. Heta niha li gor çinan pirtûk û metaryal çet ne hatine çapkirin. Ji du (2) salan zêdetir e, ku sazgeha pirtûk û metaryalên Swêd, ji çend mamoste û zumananayên kurd komisyoneke pêkanine. Ev komiyon dê isal bi destpêka dibistanan re pirtûka ji bo çina yek û diduya çap bike û biweşîne. Yê çinên din ji, dê peydey pey bîn çapkirin û weşandin. Ez bawer im, ku ev metaryal dê di dibistanan de ji aliyê pedagojik, metodik û teknik ve ji hemû welatên Ewropayê bînin minak. Ji bo rojên pêş fêda wan dê bigije Kurdistanê ji.

### LI SWÊDÊ ZAROKÊN KURDAN DI SINIFÊN TIRKAN DE

Kurdên li Swêdê, ji her çar beşên Kurdistanê û ji Lubnanê hatine. Lê, piraniya kurdên li Swêdê ji Kurdistana Bakûr in. Kurdên ku ji Kurdistana Bakûr hatine Swêdê hemû ne tengezarên politik in. Di nav wan de yê ku ji ber hoyên (şertên) abori ji hatine hene. Piraniya wan kesan bi doza kurd û bi politikayê ve naxebitin. Li Swêdê di rewşa karkerên normal de ne. Her havin diçin welat û tîn. Rewşa wan malbatên kurdan xelet (nazik) û cûda ne. Piraniya zarokên wan malbatan diçin çinên (sınıfên) tirkan. An ji ciyên ku çinên tirkan yê serbixwe nin in, li wêderê diçin çinên swêdiyan û di şûna zumanê zikmaki (dê) de ji diçin zumanê turki. Deri swêdi fêrê turki dibin. Gelo zarokên wan kesan tenê diçin çinên tirkan? Na! Zarokên hinek kesên politik yê ku berpirsiyarên rêxistinên nin ji diçin çinên tirkan. Ger ez bêjim zarokên hinek mamoste



yê zumanê kurdi bi xwe ji, di şûna zumanê kurdi de diçin çin û kursên zumanê turki. Divê hun ji vê yekê mat û şaş nemin! Ev rewş rastiyeke berçav e û berberiyeki gelek mezin e! Mirov bi destê xwe li welateki wek Swêd mehandinê pêk bîne... Li Tirkîyê ji, ji bo vi mafî tekoşin bide û were Swêd, ev mafê ku heye bi kar neyne; ki dê ji te û tekoşina te bawer bike!.. Û disa ji ber zilm û zora kolonyalizmê û faşizmê tengezar bibe û were Swêd û li mala xwe zumanê xwe, kultura xwe û adetên xwe bi ci û bi kar neyne; di nav gelek imkanan de zarokên xwe di vi wari de perwerde meke, ew çax gelo welatparêziya me li ku dîmine?

Gelo li Swêdê ji ajiyê perwer û hindekariyê de rewşa çin û mamosteyên zumanê turki çawan in? Ji sedî nod mamostên zumanê turki Kemalîst in, nijadperest in. Pîr kê kesên demokrat di nav wan de hene. Hemû pirtûk û metaryalên turki ji Tirkîyê tîn. Ji aliyê metod, pedagojik û teknik ve gelek paşvene. Ji serî heta bini naverokên wan dagirtin (işgal), şer û nijadperesti ye. Her pirtûk û babet bi fort û propaganda Kemalîzmê destpêdike û dawî naye. Ka em li vê berberî û dijîtiyê binêrin; ew kurdên ku ji ber Kemalîzmê û faşizmê

rewiyayê iro ji li Swêdê bi destên xwe zarokên xwe amedeyê Kemalîzmê dîkin. Serên zarokên wan li Swêdê ji, bi vi ideolojiya nijadperest tê şuştin! Ma gelo haya wan dî û bavan jê heye, ku her serê sibehan zarokên wan bi sonda "ez türk im, rast im" dest bi dibistanê dîkin. Û rojên wek 23 Ê Nisanê, 19 Ê Gulanê û 29 Ê Cotmehê li Swêdê ji cejnên Kemalîstan pîroz dîkin?

### BAR Û BERPIRSIYARIYA FEDERASYONE

Di vi wari de disa barê gran dîkeve ser miê Federasyona Komeleên Kurdistanê li Swêdê, rêxistin û komeleyên kurd û weşanên kurdan, pewist e, ku hemû bihev re ji doza perwerde û hindekariyê re xwedi derkevin, dê û bavan agahdar û serwest bikin. Bala sazgehên swêdi bixşinin û zarokên kurdan re bînin alîkar. Li Swêdê perwerde û hindekariya bi zumanê kurdi xurt û pêşve bînin û bînin rûniştandin. Ji welatên Ewropayê din re bînin minakên berçav. Vi doza ha roj bi roj ber bi dewletên din ve bixşinin û fireh bikin. Pêşve bînin. Pewist e, em xwe li welatên Ewropa ji bin asimlasyona kolonyalîstan rîzgar bikin!

# FAŞİZM Û REWŞA JINAN

XEZAL ARAS

Faşistên Elman hêj ne hatî bûn ser karinê, digotin: "Karûbarên jinan tenê zarok û mutfax in."

Faşistên Îtalyayê digotin: "Divê jin humberê mêran, stûyên xwe xwar bîkî û li mala xwe rûnin."

Beriya 12 Ê Ilonê li Tirkîyê jî, faşist Turkeş wek hevalbendên xwe yê diroki dipeyviya û gotinên wan di nîvan ziman: "Jin û mêr ne wek hev in. Jin nikarin karên mêran bi ci binin. Di civatê de karên wan yê giring anina zarokan in."

Ji Mussolini, Hitler û Franko bigrin hetani iroyin, tevgerên faşist bi van çavan li jinan dinêrin. Bêşik ne Mussolini, ne Hitler û ne jî faşistên din jî bo rehetiya jinan ne dişandin malê. Ev yek jî zêde heskirina zarokan jî ne dahat. Ev ditin, nimunek jî ideolojîya faşizmê bû û ev ideolojî, li ser himi nijadperesti û dijminatîya mirovahi bilind dibû.

Li Îtalyayê Mussolini, li Elmanya Hitler, li Îspanya Franko, li Fransa Petain, li Şîli Pinochet, li Tirkîyê Kenan Evren û faşistên din wek hev li jinan dinêrin. Wexta ku mirov ditin û kirinên wan dinêre, yek jî hev kêr an jî zêde nin in; weki ku hemû jî hevire hatine pişandin.

Ne hewqas dîr û dirêj, tenê nêrîna pelên diroka şerê cihanê ya duyemîn dikare faşizmê baş bide nasîkirin, hoviti û rûreşiyên wê raxe ber çavan.

Di destpêkê de partiya Nasyonal Sosyalist di programa xwe de digot: "Ji bo piştgirîna bê kariyê divê jin dest jî kar berdî, di malên xwe de rûnin û zarokan binin; ciyên ku jî wan vala dibê, mêr di wan deran de bixebitin." ev slogana faşistan, bi milyonan kesên bêkar û birçî xapand û xist pey xwe.

Wexta ku faşist hatin ser hukm, li pey hev bîyarname (qerarname) derxistin. Li gor van bîyarnaman; di dibistanan de keç û xortan jî hev cûda kirin. Ji bo keçan dibistanên nuh hatin vekirin, di van dibistanan de giraniya dersan ekonomîya malê bû. Keç ne dikaribûn dersên latîni bixwinin. Bi vi awayî xwendina keçan di universite û dibistanên bîhn de, jî navê dihat rakirin.

Ji çarekerê faşizmê yek jî ev e, ku jin di nav civatê de ci negrin û roleke aktif neleyizin. Di 30.6.1933 yan de



bîyarnamek derket, li gor vê bîyarnamê jinên ku zewicibûn jî kar hatin avêtin. Di maleke de jin û mêr di demek de nikarin bûn bixebitiyan. Jinên xwediyê karker jî nikaribûn di karên xwe de bixebitiyana. (wek doktor, muhendîs û h.w.)

Lê, ekonomî-polîtîka faşizmê, hewce darê karê bêtir û erzan bû. Vê çarê koma jinên faşist bang kir: "Belê ciyê jinan li malê ye, lê hemû Elmanya mala me ye. Divê em jî bo mala xwe xizmeteke baş bikin." Xizmeta baş jî bo xurt kirina kapitalistên yekdest (monopol) bû. Rejîma faşist, destmîza (ucet) hemû karkezan % 40 kêr kir. Lê, destmîza jinan hin jî kêmtir bû. Jin di nav rewşeke xirab de rojê bi kêmasî 10 saet kar dikirin. Hejmara van jinan di gihîştê 7 milyonan. Karên ku wan dikir zêde hostatî û zanabûn ne dixwest. Birçiti û nexweşî roj bi roj zêde dibû. Di ser de jî Hitler jî bo ordiya xwe ya faşist û êrişkar jî jinan, zarokên jindar û gurgin dixwest.

"Diyarkirina zarokan jî Hitler re" jî planek jî planên faşistan bû. Li gor vê planê, jin û keçên ciwan, divê jî nav grubên SS an (Hêzên êrişkar) de keski hîlbijartana. Gerek bi wi kesê

re meheke razana, paşê li kilinikan, ku jî aliyê Himmer de hatibûn çêkirin (Lebensborn-çavkaniya jiyinê) zarok bîniyana, peyê zarok aninê de zarok kilinik biterkandana.

Ji bo parastina paqîjîya nijada (îrk) Elman, 95.161 jinên nexweş, jî bo ku zarokên nexweş û seqet neynin dinê, hatin sterlîzekirin (hatin stewartirin) û bi hezaran jin di nexweşxanan de hatin kuştin. Bi "zagonên Nurnbergê" bi cihuyan re zewac hat qedexe kirin. Ew jinên ku berê bi cihuyan re zewicibûn, divê jî hev biqetiyana.

Bi çavên faşistan de jin kêr eql û bêyom bûn. Îdeologê faşist Julius Evola "mafên jinan tune ye, wezîfên wan heye" digot. Li Fransayê nivîskarê edebiyata Nazi û faşistan Celînê "jin û cihuwêk hev in. Her du jî nijada bîndest in. Gava ez li wan dinêrim diê min lihev dike û vedreşim." Disa filofofê faşistan yê mezî Gentile (Îtalyanî), "mêr hum bedeni, hum jî jî zihni jî jinan jêhatir in. Jin tenê di nav malê de dikarin bîbin dil (esirê) mêran. Ev wezîfê wan yê diroki ye." digot.

Tenê ev gotinên jorê baş dide diyar-

kırın, ku faşist bî kijan çavan li jinan dînêrîn. Cihu, jin û komunist, rûmete wan kesên di civata faşistan de qasî kûçikeki tune bûn.

Faşistan li 1150 ciyan qempan vekirî bûn. Ji bo jinan qemka yekemîn di meha cotmehê 1933 yan de li Moringenê hat vekirin. Pey şer rewşa qempan hin ji xirabtir bû. Edî qemp bûbûn mezbaxanên faşistan. Di navbera 1933-1945 an de 18 milyon kes anin wan çampan, ji wan 11 milyon hatin kuştin.

Li aliyê din de, dij hoviti û xwinxwariya faşizmê jinên karker, pêşverû û komunist ji, vala ne dîsekîni. Bî her cûreyî li dijî faşizmê berxwe didan. Di sala 1934 an de li Parisê "kongra Jinên Navnetewî yê li dijî şer û faşizmê" pêk hat. Slogana kongê "yekitiya hêzên jinan li dijî şer û faşizmê" bû. Ev bang ji bo berxwedana jinan di dijî faşizmê roleke mezîn liyist. Jinan, bî birûbaweriyê xurt dijî faşizmê şer dikirin.

Di sala 1935 an de keçeke alman bî navê Liselotte Herman, ji bo ku dîzi (illegal) belavok belav kiribû hat girtin; li hember eşkencên faşistan bî mîrxasî berxwe de da. Navê hevalên xwe ne got û bî giyotinê hat kuştin. Ev di diroka Elmanyê de cara yekem bû, ku jinek bî giyotinê dihat serjê kirin.

Ne li tenê li Elmanya, li welatên din jî, dijî faşizma xwinxwar jinan dibexwe didan. Li Italyayê di nav hêzên "Yekitiya Can Fidayê Azadî" de grubên jinan hebû. Hejmara wan jinan 70.000 bûn. Di nav wan de 4.563 jin aliyê rejîma faşist ve hatin girtin, eşkence ditin û hatin ceza kirin. 623 jin dan ber gulên û kuştin. 2.750 jin nefî kirin û şandin Elmanyayê. Jinên karker, di sala 1943 meha Edarê de, bî karkerên FIATê re hêzên xwe yek kirin û karberdan. Ji 20 salan vir de ev cara yekem bû, ku li dijî faşizmê karker greva (karberdan) siyasî dikirin. Vê bûyerê nêzikbûna dawîya rejîma faşist nişan didan. Û şeva 25 ê Tirmehê 1943 de faşizm li Italyayê hat hilweşandin.

Di 8 e Gulanê 1945 de jî, gelên li dijî faşizmê bî pêşngitiya Ordiya Sor li Elmanyayê û li Ewropa Navin faşizmê hilweşandin û dawîya şerê Cihanê yê Dûyemîn anin. Dawîya Hitlerê har jî hat.

Li Elmanyayê hilweşandina faşizmê û Hitler, ji bo gelê Dînê yê azadixwaz bûyereke mezîn bû. Lê belê faşizm, ji binive ne hat rakirin; ji bo ku imperyalîzm û kapitalîzm hetanî hebe, faşizm jî dê hebe. Îro jî, gelek gelên welatan, di bin nîrên faşizmê de tînin pelçiqandin. Ji wan yek jî, gelê me û welatê me ye.

Ji 12 ê Îlonê vir de, faşizm xî jî zilm û zodariyê tiştê ne anî jî gelê me re. Bêkari, birçîti, eşkence, zindan û fahişetî bû jiyana mirovên me. Beriya 12 Îlonê li Tirkîyê û li Kurdistanê Tirkîyê jinên pêşverû û demokrat, li gelek ciyan

yekitiya jinan pêk ani bûn û komele û rêxistinên saz kirî bûn. Cunta faşist, ewan gişt ji navê rakir. Û kesên ku di van komele û rêxistinên de xebiti bûn, hatin girtin, ezyet û eşkencên bê hempa ditin.

Îro, jina serokwezîrê Tirkîyê "di derheqê parastina mafên jinan de problemê me me tune ye" dibêje. Bî rasti jî, problemên jinên burjuvan ew e, ku gelo kijan model otomobil ji xwe re bîkîrin, li kijan welatî havîna xwe derbaz bîkîrin, li Parisê kijan modeyê nuh derketî ye? Haya wan ji problemên milyonan tune ye. Bavê wan, brayê wan, mîrê wan di zindanan de nînin, ew nakewin girtigehan, ew deriyê girtigehan jî nasnakînin.

Li gor rojnemeyên tirkî, beriya 12 ê Îlonê hejmara fahişan 2000 bûn, piştî 12 ê Îlonê ew hejmar derket 230000 an. Ew hejmara resmî ye. Ji bilî yê ku keçên xwe, jinên xwe bî peran difroşin, her roj di pelên rojnaman de derdîKevin. Ev rûreşîya faşizmê ye.

Sekreterê sendîqa OLEY-İŞ (TURK-İŞ) dîgot "di van salên dawî de hejmara jinên fahişê gelek zêde bûne, tu mafekî wan tune. Em dixwazin wan bîkînin endamê sendîqayê. Ji bo vê yekê me, ji hukumetê re pêşniyarek bîr û hukumetê bersivêkê gor daxwaza me da." (Hurriyet-16.3. 1984)

Ew yek baş dîde ber çav ku ne derdê hukumetê û ne jî derdê sendîqa Zer TURK-İŞ, ji navê rakirina fahişetî, nînin e, ew dixwazin vî rûreşîyê meşrû û resmî bîkînin, ku hin jinên bêkar û birçî jî bîkewin vî tora bênamûşiyê.

Rûyê cunta faşist, roj bî roj eşkera dibe. Edî dayikên me jî dibinên, ku bîdengî tenê kêrê faşizmê tê. Ji bo vî yekê jî, li dijî cunta faşist cara pêşîn jinên Kurdistanê û yê Tirkîyê dengên xwe blînd kirin. Di nav sal 1984 an de gelek dê û jinên girtîyan, bî cilên girtîyan yê bî ber koşka şerê cuntayê, zilma wan protesto kirin. Di sala 1984 an de wexta sefera serokê cuntayê Evren û Özal, jinên Kurdistanê zilma faşizmê, birçîti û bêkariyê protesto kirin.

Li her derê Dînê îro, bî milyonan jin, ji bo aştî, azadî û wekhevîyê şer dikin. Pêwîst e, jinên Kurdistanê jî di nav refên jinên cihanê de ciyê xwe bigirin. Serketina tevgera netewî û civakî her tim girêdayê ci girtîna jinan e. Wisa jî, rizgarbûna jinan girêdayê tevgera karker û xebatkarên e. Şerê gelê me yê bîndest û tekoşîna wî ya netewî û civakî, hewcedarê jinên Kurdistanê ye, ku wan organîze bike û tevî tevgera azadîyê bike.

Ev tişt gerek ne ye jî bîrkirîna: Di cihanê de tû diktatorîyek tune ye, ku bê piştgirtîya jinan bîkaribe li ser piyan raweste û di sala tû diktatorîyek tune ye ku bê tekoşîna jinan bêt hilweşandmê.

## bersiva cend pîrsan

Wek tê bîra xwendavanên me, heval Tengezar jî me re nameke şandî bû. Heval di nama xwe de di derheqê zîmanê kurdi de çend pîrsan jî me kirî bû. Me, nama heval Tengezar di hejmarê Berbangê ya çaran di rûpelên 12 û 20 de weşandî bû.

Lê, bî rasti bîla Heval Tengezar li me bibore ku me, bersiva nama wî di eynî hejmarê de ne da.

Wek Heval Tengezar jî di nama xwe di diyar kirî bû, ku hêzên kolonyalist û nijadperest bî salan, in ku xwendin û nivîsandina zîmanê me, qedexe kirine. Ji vî sedemî jî, yekitiya zîmanê me yê nivîsê îro nînin e. Û her wiha nivîskarên Kurd an jî yê ku bî kurdi dînivîsin, pîraniya wan bî devoka gundê xwe an jî ya bajarê xwe bî kar tinin. Ji ber vî yekê jî, hînek bêje (kelimê), kite (hece) û tipên (herfên) wan hev nagrînin. Cûda cûda dînivîsin. Ev rewş serê gelek xwendevanên Kurd tevî hev dîke. Lê, hezar mîxabin heta ku saziyeke (muesseseke) zîmanê me pêk ne ye dê ev rewş wîha bî ser û ber berda berdayî jî dom bike.

Hevalê hêja!

Bî ditîna min, a rast mirov nîkare jî wa n bersivên pîrsên te re bîje, ku ya yekem an jî ya duyem rast e. Du cûrên devokan (şivan) in. Wek ku te jî nivîsandî bû, "ji min re" an "ji min ra"; di mal de" an "di mal da" û "bî min ve" an "bî min va" û h.w....

Lê li gor grametîka zîmanê kurdiya ku Celadet Bedîrxan bîngehê wê daniye; "de, re" û "ve" ye. "da, ra" û "va" li Kurdistanê di nav gel de gelek kêmtê bî karanînin. Û ev, devokeke hîşk û qeba ye. Di sala bî taybetî ew kesên ku dawî de kurdi fîrbûne û îro bî kurdi dînivîsin, wê devoka teng û hîşk bî kar tinin.

Navê wan di zîmanê nivîsê de daçek (preposition- ad takîs) in.

Em, ji te re Berbang dîşeynî û silavên xwe bîrê dikin!



# REXNE

## ZINARÊ XAMO

### Jî REDAKSIYONA BERBANGÊ RE

Di dû Kongra Federasyonê ya îstîsnaî, hejmarek Berbangê derket; hejmara 3 an. Piştî ku min ev hejmar (3/85) xwend, min pêwîst dît ku wê namê binivîsînim. Ezê di vê nama xwe de li ser çewtiyên ku di Berbangê de bala min kişandin bisekinim; li ser wan dîtina xwe bibêjim.

Di Banga Berbangê de wisa tê gotin "Bi rexne û pêşniyariyên xwe ve Berbangê xurt bikin û pêşve bibin." Bê guman daxwazek di cî de ye. Ji ber ku, kovarek bi rexne û pêşniyariyan tişteki wenda na ke, çels na be. Û ji vê de jî bikeve, bi saya van rexne û pêşniyaran dikare hîn zûtir bi kêmasî û çewtiyên xwe hay bibe û wan rast bike. Ev yek wek hemû kovaran, ji bona Berbangê jî wisaye. Û dikarim bibêjim ku, ji bona Berbangê hîn jî girîngtîre û bêtir hewcedarî jê re heye. Gelo çima? Ji ber ku Berbang, kovara Federasyonê ye û 15 komelên endam temsîl dike; dîtina 15 komelan tîne zimên. Yanî li ser navê 15 komelan weşanê dike. Loma jî divê hemû komel li Berbangê xwedî derkevin, jê re pişgiriye bikin û lê miqate bin. Ji ber ku dema çewtî û kêmasî hebin li ser navê wan jî tê kirin. Û ji aliyê din jî divê berpiryarên Berbangê jî bizani bin ku ew, kovara komela xwe na weşînin, kovareke li ser navê 15 komelan diweşînin. Divê ev yek di dema weşanê de tu carî neyê ji bîr kirin. Lê li gor bawerîya min Redaksiyona Berbangê di hejmara 3 an de li vê yekê qet miqate ne kirîye û loma jî bûne sebebên hin çewtiyên mezin.

Ev çewtiyên ku ezê li ser bisekinim, çewtiyên îdeolojîk in, li dijî bîr û bawerî û xebata Berbangê ne û divê dîtînen wisa çewt di Berbangê de ne yên weşandin. Ezê nuha bi kurtayî vana rêz bikim.

Di rûpela 21 ê de pêkenînek bi navê Tirk, Erebi û Ecem hatiye weşandin. Nivîskarê "pêkenîne" Birîndar e. Rast navê "pêkenîn" hatiye danîn. Lê tu têkiliya nivîsê û pêkenîne bi hev tune. Û ji alî edebî ve jî qet pêncquruşa nake. Lê belê esas rexneyê mezin ne ev e. Rexne min li tema (dîtin, fikir) "pêkenîne" ye. Di "pêkenîne" de (Navê wê pêkenîn hatiye danîn, lê belê rastiya wê xeberok e)

bi hawakî gelek eşkere nîjadperestî tê kirin, ji gelê Tirk, Erebi û Faris re bi hawakî pîrr qebe xeber (çêr) tê dain. Yanî rabûye raste-rast gotiye, ez wa-wayî di..... Ereban, Tirkan û Farisan bikim.

"Pêkenîn" bi kurtayî wisaye Kurdan ji xwe re qesrek sipî lê kirine. Lê piştî ku qesra xwe diqedinin teyrek tê bi ser qesra wan de zilqê dike. Ev yek çend caran dom dike. Di dawî de radi bin teyr digrin û jê re dibêjin:

"—Qurban! ma çi heqê te li me heye? Tu çi kesî?

Teyr awirên xwe tûj kir û bersiv ne da. — Heyran, tu misliman î, tu durzî yî, tu êzdî yî, tu cihû yî? Çi heqê te li me Kurdan heye? Sedemê wê barbarî û zikreşîya te çi ye?"

Hetanî vira "pêkenîne" ev jê derdikeve: Dema teyr misliman be, dūzî be, êzdî be, yan ji cihû be ev barbarî û zikreşîya wî tişteki tabî ye. (normal e). Ji ber ku ev yek ji wan milletan tê payin û loma jî jî teyr tê pirsîn, tu çi kesî? Wek ku li ba me dema yekî tişteki pîrr xerab bikira, jê re digotin, "ma tu gawur î, tu çi yî? Yanî xerabiye wisa ji yekî gawur tê payin. Ev pirsîsa jî teyr tê kirin jî wisa ye, dema teyr bibêje ez misliman im, durzî me, êzdî me, yan jî cihû me wê demê tiştê teyr kirîye tabî ye, ne anormal e. Lê belê ev cardin ne tişteke, ev nîna ye, tîrnîya hîn li dû ye.

"Pêkenîn" dom dike, teyr bersivê dide: "—Ez ne misliman im, ne êzdî me, ne cihû me jî!..

—E! naxwe tu ji kîjan qewmî ye? Ew qewmê barbar kî ne?

Got:

— Qala barbariyê nekin! Bavê min Erebi e, diya min Ecem e û ez bi xwe jî Tirk im. Ez adetên bav û kalên xwe dimeşînim!" Di vir de mesaja ji xwendevanan re tê dayin ev e: Tirk, Erebi û Ecem û Faris barbar in. Başê, gelo Redaksiyona Berbangê jî wisa difikire? Ger wisa na fikire, çima dihêle tiştên wisa berradayî di Berbangê de bê weşandin? Di rêzên jorîn de propagandaya dîtînen nîjadperestî tê kirin. Divê nivîsê wisa (Bi çi navî dibe bira bibe) ku dijîniya gelen bike, di Berbangê de neyê weşandin. Ji ber ku Berbang, kovarek pêşverû ye û ew ne platformek dîtînen

nîjadperestiyê ye. Em bibêjin ku ev "Pêkenîn" di kovarek pêşverû (yên paşverû tu gazina me jê tune) ya Erebi, Faris, yan ji yeka Tirk de bihata weşandin, me yê ji wan re ne gota çi? Me yê çi nav li wan bikra? Me yê kevir û kukî li wan ne baranda?

Bê gumançfroku "pêkenîn" ên wisa di nav her milletî de hene, kesên milliyetçî wana dibêjin û dixwazin gelan dijînen hev nişan bidin. Lê belê kesên şoreşger û pêşverû li hember van dîtînen nîjadperest derdikevin û enternasyonalîzmê diparêzin; biratî û dostaniya gelan diparêzin.

Dîtînen nîjadperest di hejmara 3 an de ne bes di "Pêkenîna" Birîndar de hatiye parastin, di nivîsa A. Tigrîs de jî dîtînen nêzî yên Birîndar hatiye parastin. Di rûpela 3 an de di derek nivîsa xwe de A. Tigrîs wisa dibêje: "Ji hêla politîk ve jî, civaka Kurd, ji hemû civak û grûbên biyanîyan aktîftir û hêjatir e." Di vir de du îdiayên gelek ciddî hene. Yek, Kurd jî hemû biyanîyên (xeriban) ku li Swêd dijin aktîftir in. Dudu, Kurd jî hemû biyanîyan hêjatir in. Li gor bawerîya min îdia "aktîftir" bûnê bes îddia ye. Ji bona ku meriv kari be bibêje Kurd jî hemû biyanîyan "aktîftir" in divê di destê meriv de hîn tişt hebin. Û divê bi kêmasî meriv bizani be, hemûyên biyanîyan çi dikin, çawa dixebitin. Û di dû re jî meriv xebatên wan û yên Kurdan bide hember hev, hela ka gelo kî pîrr "aktîftir" e. Ez bawer nakim ku A. Tigrîs xebatên hemû biyanîyan jî nêz ve bizanibe. Mesele, gelo bi çi hawî ew Kurd, ji Îranîyan û Latînerîkayîyan "aktîftir" in? Ev yek ji bona min ne zela e, dikare li ser munaqêşe bibe. Lê A. Tigrîs, qet riya munaqêşeyê tê de ne hiştîye, "Kurd jî hemû biyanîyan aktîftir" e.

Em werin ser îdia duduyan, hêja bûna Kurdan ji hemû biyanîyan. Bi rastî dema min van rêzana xwend ez ji xwe re şaş mam. Gelo insanekî ku ji xwe re bibêje ez şoreşgerim çawa dikare bibêje "Kurd jî hemû biyanîyan hêjatir e"? Ez bi xwe ne di wê baweriyê de me, ku tişteki me Kurdan jî biyanîyên din "hêjatir" be. Ez li ser vê îdia A. Tigrîs gelekî fikirim, gelo çiyê biyanîyên din (Erebi, Tirk, Faris, Asûri, Yewnan,

Yûgoslav, reşik, hemû gelên Latîne-merîkî û.h.w.) ji me Kurdan kêmtir e û ne hêjatir e? Lê min tu kêmasî di van milletan de ne dit. Nizanim A. Tigrîs, çiyê me Kurda ji biyanyên din hêjatir dibîne wiya meraq dikim!

Erê hetanî nuha gelek kêmasî û çewtiyên Berbangê bûn. Lê belê tu carî dîtî-nên wisa çewt û nijadperest di Berbangê de ne dehatin parastin. Ez hêvî dikim ku wê hevalên Redaksiyona Berbangê carek din ne hêlin ew nivîsên milletan biçûk dibîne û dijminatîyan milletan dike di Berbangê de bên weşandin.

Di rûpela 6 an de nivîsek bi navê "Alternatîfa Federasyonê" hatiye weşandin. Nivîskarê nivîsê B. Welatevî e. Welatevî çala kongra Federasyonê ya Îstîsnâ dike û wisa dibêje: "Bi kurtayî qaşî ku ez tê gehîştîm, piraniya nûneran ser van qisan rawestan.

— Federasyonê me û komelên me bi rastî û îlmî ne demokratîk in " ev îdia ji serî heta binî ne raste, piraniya nûneran rane bûn û ne gotin Federasyonê me û komelên me na " ne demokratîk" in. Du nûneran tenê tiştên wisa gotin, lê gelek nûner jî li dij vê dîtîne derketin. Welatevî vê dîtîne bi hawakî wisa dibêje ku yanî hemû nûneran gotine Federasyon û komelên me na ne demokratîk in. Di kongrê de li ser gelek tiştî hat peyivandin, gelek tiştên ku meriv pê dikeniya hat gotin. Lê evana ne dîtina piraniyên nûneran bûn. Welatevî dîtina du kesan dike wek dîtina piraniyên nûneran, lê ew nûnerên ku li dij vê yekê derketin tew çet çala wan nake. Cardin li gor vê dîtîne hetanî nuha hemû komelên Kurdan antî-demokratîk bûne û eger ku Federasyon li gor komûnan (belediyan) neyê ava kirin wê her antî-demokratîk bimînin. Wê demê jî divê hemû Kurd, yan jî bi kêmasî ew kesên di di vê dîtîne de ne divê komelên xwe fesih bikin. Ji ber ku divê komelên antî-demokratîk bê xera kirin.

Ya din jî Welatevî, "îlm" jî ji vê dîtina xwe re şahîd nîşan dide. Piştî ku li gor "îlm" jî ne demokratîk be, divê bê gotin qebûl bibe ku Federasyon û komelên Kurdan "ne demokratîk" in. Ez meraq dikim, gelo ev kifjan "îlm" e ku Federasyon û komelên me na li gor wî " ne demokratîk" in? Welatevî dibêje ku ez Federasyon û komelên antî-demokratîk, dibînim, ew dibêje, "bi rastî û îlmî" ne demokratîk in. Welatevî çala demokrasiyê dike, lê belê hîn tê ne gihîştîye demokrasiyê çî ye. Ezê di beşa dîtina Welatevî ya demokrasiyê de li ser vê yekê bisekinim.

Welatevî dom dike.

2—" Federasyonê me bi vî halê xwe, Kurdên ku îro li Swêdê dijîn, wan temsîl na ke. Û bi vî ( yanî bi vê rewşa xwe Z. X.) rewşa xwe bersiva problemên

Kurdan nade." Sebebê çima Federasyon Kurdan temsîl nake Welatevî di niqta çaran (4) de gotiye. Ev jî ev e:

4- " Di Swêd de ( Ne di Swêdê de, li Swêd) qaşî 6000 Kurd hene. Lê di nav komelên de 334 insan mane. 5666 insan li derê komelên û li derê Federasyonê ne." Em ji serî de dest pê bikin. Çima Federasyonê Kurdan temsîl nake? Bersiva vê pirsê di niqta 4 an de hatiye dayin, piraniya Kurdan ne di nav Federasyonê de ye. Ev dîtîna kongrê ne parast, piraniyan endaman ne parast; bes nûnerê tiştêkî wisa got. Lê bi kêmasî bi dehan nûner li dij vê dîtîne derketin. Welatevî çet çala wan nûneran na ke, ew gotina nûnerêkî wek dîtina hemû kongrê nîşan dide. Ev tiştêkî ne baş e. Em werin ser mesela temsîliyê. Li gor dîtina welatevî, rêxistînek jî bona ku gel temsîl bike, divê piraniyan gel bi wê rêxistî-nê re be. Ev dîtînek jî serî hetanî binî çewt e. Ger em vê dîtina Welatevî qebûl bikin, wê demê çet yek rêxistînek Kurdan jî îro Kurdan temsîl nake, partî û komelên kevneperestan, yê hêzên mêtîngehkar Kurdan temsîl dikin. Ji ber ku piraniya gel bi wan re ye. Divê em bibêjin tu komelek pêşverû, tu partî-yeke komonîst gel temsîl nakin. Ji ber ku piraniya gel bi komel û partîyên bûrjuvazî re ye. Min di kongrê de jî gotî bû, nuha jî dibêjim, ew nûnerê ku hejmara Kurdan derxisti bû berpirsiyarê komelekê bû; li komuna wî 500-600 (texmîni dibêjim, dibe ku kêm be, yan jî zêde. Bes ji bo mîsalê ) Kurd rûdinin, gelo çend Kurd bûn endamên komela wî? Gelo ji bo çî hemûyên Kurdan ne bûn endamên komelê? Û ev komele li gor komunê jî hatiye ava kirin. De nuha ji bona ku hemû Kurdên komuna Botkyrkayê ne bûne endamê komelê emê bêjin ev komele Kurdan temsîl na ke, antî-demokratîk e! Ev yek jî bona Federasyonê jî wisa, ez ji nuha de senedê didim, dema Federasyon derbasî sistema komûnan bibe jî wê cardin 6000 Kurd neyên nav Federasyonê, wê cardin piraniya Kurdan li derî Federasyonê bimîne. E divê em wê demê jî bibêjin Federasyon Kurdan temsîl nake. Çî rêxistînek dibe bira bibe, temsîl kirina gel ne li gor hejmara endama ye, li gor çî siyaseta diparêze, li dij kê ye û hevalbendê kê ye. Pîvan ev e. Bê guman piraniya gel pê re be baş e, lê dema piraniya ne pê re be jî ev nayê wê manê ku ew gel temsîl dike.

Welatevî di niqta 3 an de jî wisa dibêje:

3—" Komele bûne buroyên rêxistî-nên siyasî. Bi vê rewşê wisa tê xwîyanî kirin ku xebata siyasî pêşîya xebata demokratîk girtiye." Eger ku ez ne di kongrê de bama, dibe ku min bigota rast e. Lê wer xuyaye ku Welatevî, tiştê di kongrê de hatiye axaftin ne nivîsandî-

ye, ya dilê xwe nivîsandiye. Carê berî her tiştî ew komeleyên ku di kongrê de beşdar bûn piraniyan wan ( ku ez ne şaş bim 15 komele di kongrê de beşdar bûn û ji van 15 komelên zêdetirî 10 ên wan hevalên hêreketan bûn) hevalên hêreketan bûn. Û tu kesî ji ji van rane bû ne got komela me bûye buroya partîyê. Em dibêjin ku nûnerêkî, du nûneran di kongrê de tiştêkî wisa got, pîr ne ecêb e, em jî devê hin kesan her roj gotinên wisa dibîzin, ma divê em yek bibe wek dîtina piraniyan nûneran û di Berbangê de bê weşandin? Li gor baweriya min bi weşanên wisa Berbang xizmetê ji yekîtiya Kurdan re nake, bêtir nakotiyê dixê nav wan; divê ji nuha û pê ve li vê yekê miqate be.

Welatevî dîtînen xwe li ser demokrasiyê wisa diyar dike:

" Ev komele dê li ser bingehê demokratîk sazbin. Lê ne wek komeleyên îroyîn! Demokratîk ne tenê tê vî manê ku mirovên ku dîtînen yekbin bîne ber hev û komele dînin û ji vê yekê re bêjin demokratiye. Komelên demokratîk mirovên ku dîtînen wan cûda, welatparêz û siyasî dijî faşizmê û koloniyalizmê be, an jî bi dijînin re kar neke, di vî warî de karin bi hev re çibigrin û bixebitin." Piştî van gotinên jorin wek her xwendevanî ez jî fêr bûm, ka gelo demokrasiyê çî ye! Û komelên demokratîk çawane! Li gor reçeta Welatevî ya demokrasiyê, ew mirovên ku dîtînen wan wek hev bin û bi hev re di komelekê de çî bigrin, ew komele ne demokratîk e. Ji bona ku komele demokratîk be, divê dîtînen endaman ne wek hev bin, yanî siyasî wek hev ne fikirin. Wê demê, hemû Partî û komelên komonîst ( ez çala yê burjûvazî nakim) ne demokratîk in. Ji ber ku yê siyaseta wan ne parêze nikare bibe endam. Wê demê hemû partî û komelên welatên sosyalîst ne demokratîk in. Ji ber ku kesê ne komonîst be nikare bibe endam. Mirov dikare van minakana hîn jî dirêj bike, lê ne hewceye. Ya din jî, hemû endamên komelên me na jî wek hev na fikirin û ji xwe ev ne mumkune jî, bes li dora hin armancên muşterek hatine ba hev, hewças. Li gor baweriya min demokrasiyê ne wek Welatevî dibêje ye. Komelek, rêxistînek bi destûra xwe, bi meşandina destûra xwe û bi wek heviya di nabêna hemû endaman de, yanî bi wek heviya mafê hilibjartin dengdan û axaftinê demokratîk û ne demokratîk bûna wê diyar dibe.

Rexna min ya dawî ji li ser nivîsa Berxwedana 15-16 ê Hezîranê ye. Bê guman liberxwedana 15-16 ê Hezîranê di dîroka çîna Karkerê Tirkiyê de rojek gelek girîng e, divê meriv vê rojê jî bîr neke. Lê belê kovarek wek Berbangê de ji bona vê rojê sê (3) rûpel veqetandin li gor ba-

# ji nav padîşahê kurdan-1-

## KEYQUBBADÊ KURD

BRÎNDAR

Keyqubbadê Kurd, berî Zayînî-Berî Mîladî— di sala 853 ê yan de bi piraniya dengên Kurdên "Kaspînê" li ser textê padîşahiye rûnişt.

Navê wî yê rastîn "ARBAS" e. di wan deman de Împaratoriya ASUR bê perwa hespên xwe li Kurdistanê dibezandin.; bi kuştin, talankirin û xwînrijandinê Kurdistan wêran dikirin. Ji vê sedemê prens û rîspiyên Kurdên KASPÎNÊ, li hev civiya bûn û prens ARBAS bi navê "KEYOUBBADÊ KURD" padîşah hilbijarti bûn.

Çaxa ew bû padîşah, berî her tiştî kesên ne baş û çepelkar ji nav xwe rakirin. Kurd û komikên dorhêla xwe di bin fermandariya xwe de civand. wî rêdanên hêj a rêz kir û di welatê xwe de dadimendî pêk anî. Diwan deman de bi çareyên bîrewerî û jîrekî yên Keyqubbadê Kurd, Kurdistan seran ser ava bû, bextiyar bû. Keyqubbadê Kurd, çaxa bi van karûbaran ve dadiket, karê leşkerî jî, ji bir ne dikir. Wî tim daxwaza ordiyeke mezin û bi azmade (tecrûne) dikir, da ku karibe li hember leşkerên ASÛR cengbazî bike. Bê guman Kurd jî, cengawer, mêr,

zorbaz, çalak û şervan bûn. Lewend, karzane, bedenbaz û mertalger bûn. Lê, sazûmendîya rêzana ordiya Kurd, wek ya ASÛR têkûz û tebut ne bû.

Keyqubbadê Kurd, di vê xala qels gihîştî bû û loma armanca serrastkirina oriyeke têkûz dikir. Wî ji aliyê din jî, giraniya xwe dida ser bend û besta (dîsîplîna) leşgerên Kurd. Wî Baver dikir, ku çaxa ordîke bi bend û best, rêzan û bedenbaz, ordiyeke di bin fermandariya serdarên pîspor û cengbaz bîne meydane, wê zora leşgerên ASÛR bibe û bigihê armanca xwe.

Keyqubbadê Kurd, bi salan ji bo pêkanîna ordiyeke têkûz xebitî. Piştî vê keftelefa han, wî ordiya xwe kir sê bir:

1— Leqên Cengê, 2— leqên siwaran, 3— leqên peyan. Leqên siwaran û peyan jî bi biran beşkirî bûn. Birên "tiravêjan", birên "gurzan" yên "riman" yên "şûr û mertalan" yên "kemendavêjan" û yên "Kevkanîkan....."

Piştî van karûbarên giran, Keyqubbadê Kurd leşgerên xwe sipart fermandarên Karzane, hunerwerên şeran û cangawerên rojên giran û meydane mêran!

Keyqubbadê Kurd di ordiya xwe de bend û besteke xurt pêk anî bû. fermandarên piçûk ji fermandarên mezin re stuxwarî dikirin. Gotina fermandarên xwe li erdê ne dixistin. Bi vî awayî ordiya Keyqubbadê Kurd, bû ordiyeke xurt, hunerbaz, bi bend û best û rêzandar.

Gava ku Keyqubbadê Kurd bi wan karûbaran ve dadiket (karê bajarvanî bazirganî) karê balyozî (konsolosi) û yê konevanî jî, ji ber çavên xwe ne dibir. Keyqubbad, ji bin ve û veşartî bi waliyê "Babilê" re yekdestî danî. Paşê "ELAM" ji xist nav vê yekdestiyê. Wan deman Faris ji ketibûn bin fermandariya Kurdistan.

Li gor tê gotin Keyqubbadê Kurd, ev karûbar di 88 salan de anî meydane. Wî 120 sal temam kir û 94 salan tacdarî (padîshahti) kir. Berê peytextê "MAD" an bajarê

"TESFUN" bû. Paşê ji bo ku karibin welatê xwe çêtir ji ASÛRAN biparêzin, "HEMEDAN" ji xwe re kirin peytext.

Keyqubbad, piştî ev karûbarên giran bir serî, da pêşiya oriya xwe û bi 400.000 leşgerên Kurd riya Asûran girt. Babîlî, Elam û Faris ji, ku yekdestên Maden bûn, xwe tevî leşgerên Kurdan kirin.

Gava padîşahê Asûr "Sardanapal" ev nûçe bihîst, tevî leşgerên xwe ve derket derveyî "Nînowa" yê. Li gor tê gotin, her du oriyên li hemberî hev rêza cengê girtin. Her du aliyên jî, di mêranî hunerbaziyê de tu kêmasî ne kirin û êrîşên dijwar dibirên ser hev. Ev êrîşên giran û xwînrej 5 rojan dewam kir. Paşê ordiya Asûr ya giran, ordiya du hezar sal şikest. Asûr ji neçarî ji hola cengê vekişiya û xwe avêtin paş bedenên NÎNOWA.

Piştî vê bûyerê, ordiya Kurdistan tevî hevalbendên xwe Nînova dorpêç kirin. Dorpêçiya bajêr du salan ajot. Sala sîsiyan dema biharê, ava çemê Dîclê û hîn çemên din rabûbûn. Ordîya Kurdistan, bendên avê çêkirin û ava Dîclê û çemên din bi aliyê bedenên Nînowa de berdan. Bedenên Nînowa xwe li hember vi lehiya çeman ne girt û cîh bi cîh diwarên bedenê herifîn û hilweşiyên.

Padîşahê Asûr "Sardanapal" li hember vê bûyera han ji taqat ket û bi careke hêviya xwe ji her tiştî birî. Sardanapal, tevî jin û zarokên xwe, bi hemû fermandarên xwe ve, bi rext û çekên giran biha, kenzên gewherî, almast û mirariyan, ket birceke (qesrek) û agir bera birca xwe da. Xwe, meriv û mal û hebûna xwe tev şewitand.

Keyqubbadê Kurd, Berî Mîladê di sala 759 an de çû ser heqiya xwe. Wî, 120 sal temam kir. Keyqubbad, 94 salî padîşahî kir. Keyqubbad, çaxa mir 5 kurên wi hebûn:

1— Key Kamus, 2—Key Apû, 3— Key Arîş, 4— Key Armîn, 5— Key Pasîn.

weriya min ne rast e. Di kari bû bi kurtayî wek bîranînek, wek xeberekê bihate nivîsandin, lê ne hewças dirêj. Ji xwe Iro hêzên Tirkiyê edî vê rojê bi vî hawî di bîr tînin. U ez bawer dikim ji bona me Kurdan gelek bûyerên jî bîranîna 15-16 ê Hezîranê hîn girîngtir hebûn ku divê di dêlî vê nivîsê de bihata weşandin.

Ger ku nama min hin kî dirêj bû li min bî borin. Hêvî û daxwaz dikim ku hûnê dikar û barên xwe de ser kevin.

18/8-85

NOT:

Eger mumkun be nivîsa min bi kumuk (î-i) binivîsîn. Lê ger ku mumkun be û çewtiyên dakîloyê jî pîr ne bin wê baş bibe. Di vê hejmarê de çewtiyên dakîloyê hindik in.

BERBANG— Em dê di hejmara 5 an de bersiva Zinarê Xamo bidin.

## DESRTPEK

Gelên Indo-Ewropayi, beriya Miladê ( B.M.) 3000 sal ji warên xwe bar kîrî û li cihanê belav bûn. Li gor dirokzanan, warê Indo-Ewropayî li Rojhilata Ewropa bû lê belê niha iro ji, bi başî birov nikare warê wan gelan lokalîze bike (ciyê rasti bîbine). Gelên Indo-Ewropayi, di dema xwe de koçer bûn û ji eşîrên mezîn pêk hatibûn. Xwedi pez û dewar bûn û ci bi ci dîgeriyan. Armanca wan girtina warên bi şînahî û avî bûn. Gelên Indo-Ewropayi, bi sê beşan li cihanê belav bûn. Beşa yekem, xwe li Îtalya û Yewnanîyanê bi war kîrî; beşa duhem berê xwe da Skandinavya û beşa sîsêyan ber bi Îran û Hindistan, Mezopotamya û Anadolê ve beşîya. Ew beşa sîsêyan ji xwe re digotîna Ariya, an jî Ari, yani paçj û esil. Gelên Indo-Ewropayi, heya roja iro ji, di hînek meselan de weki avahî û grametîka zîman, nêzbûna xwe parastîne. Gelek peyv û misal, çîrok û çîvanok di zîmanê Indo-Ewropî de nêzikê hev in. Mîrov dikare bêje; ku gelek caran weki hev in. Di aliyê mitolojî de gelê Yewnan, Îtalyan, Îrani û Kurd, Hindi û Belûci, Afgani, Hîştên nêzîkî hev bi kar anîne. Dirok û zîmanên wan gelan tesîr li hev kîriye, hînek di merhela diroki de ji dirokê rabûne. Nemanê û hînek dewlemend bûne û ji hêla zîman û kutur de pêşketîne.

## ZERDEŞT KÎ YE?

Diroka olê Zerdeşt, bi koçkirina gelên Indo-Îrani ve destpêdike. Ewan Berê Miladê di 2000 salî de, li Îran û Hindistan û Mezopotamya û li Anadolê bi war bûn û dewlet awakîrî. Kutur û sîvilayeti pêk anîn. Bi navê Hattî, Mitanî (Metînî) Skytî (sîtî), Madî, Farsî, Sasani, Xurî û Elamî dewlet û hebûn awakîrî. Wan, berî Zerdeşt ji xwedî ol bûn. Ew ol ne hatîbûn nîvisandî, gelek car ibadet li serê çîyan dahatî kîrî (rewşa goçer-

tiyê), warê rûnîştî wê gavê tune bû. Olê Ind-Îraniyan ne tekûz û sistematîzekîrî bûn.

Zerdeşt, di vê rewşa diroki-kulturi de, ji olê Indo-Îrani îlham girt û li ser oleke nû xebat kîr. Zerdeşt, gelek peyv û nav ji olên Ind-Îrani girtiye, weki Mitna, Ahura Mazda, Angra Manyu ûhw.. Zerdeşt, ji eşîreki Madî bi navê Spitama ve tê. Ew, ji malbeteke aristokrat, xwedî pez û erd (ax) bû. Bi kutura pez, şîvanti û gavan-tiya Zerdeşt hate xwedî kîrî; kutura koçertiyê girt. Weki tê zanîn û gelek kesan qebûl kîriye; merovê koçer aşîxwaz e. Ne barbar e. Şî-nayî, dar û ber, avê û axê dîparêze. Ji yana koçeran li gor sîrkulasyona (gerandîna) tebiyetê tê organîze kîrî. Koçer, jiyanê û hebûnê dîparêze, pez û dewaran zêde dîke. Hevalê jiyanê ye û dostê mirîne ye. Lê belê merovê barbar û zordest hevalê mirîne û dijminê jiyanê ye. Zerdeşt, felsefe û exlaqê xwe li gor vê rastiyê durîst dîkîr. Çandîni û koçerti du bîngêhên esasîne ji bo felsefe û îdeolojiya Zerdeşt.

Li ser çêbûn û xebata Zerdeşt, ditînen cûrbe cûr hene. Filozofê Yewnan Platen û akademiya Wê, Zerdeşt, Berî Miladê di 6000-5000 salî de xebat kîriye û jiya ye. Hînek jêberên Yewnan ên dîni jî, dibêjin ku Zerdeşt beriya Platen 6000 sal jiya ye. Platen, bi xwe 400 sal berê Miladê hebûye. Ditîneke dîni jî, dibêje, ku Zerdeşt 5000 sal beriya Şerê

## BAŞ BIFIKIRE, RIND BIBÊJE Û JENCI BIKE!

## ÇEND GOTIN LI SER ZERDEŞT

Truva hebû ( bezeke N.Y. Berg. s 29). Ew ditînen cûre cûr sebebên wê heye; olê Zerdeşt di destpêkê de ne nîvisandîbû û ji ber vê yekê spekulasyon li ser diroka xebata olê Zerdeşt zêde bûne.

Li aliyê dîni, merov dikare diroka olê Zerdeşt ji xebata kronolojiya gelên Ind-Îrani derxe. Zîmanê olê Zerdeşt Ind-Ewropayî ye. Di Zend Avesta de hînek nav û war, serdar û dewlet tê gotî. Ji wan merov kare netîca dirokê û kronoloji derxe. Wê çaxê merov dikare bêje, ku Zerdeşt beriya Dewleta Akamênî ( 550-320. B.M.), hebû. Li gor texmînen iro ku li ba gelek dirokzanan heye, ku Zerdeşt di navbera 1500-800 (B.M.) jiya ye. ( bezeke Peterson û Parînder) Îro, merov baş dizane ku olê Indo-Îraniyan ji bo olê Zerdeşt re bûye hîm. Weki tê zanîn olê Îsrailî bûye, esas ji bo olê filehtiyê. Filehtî, dewama olê Îsrailî, Zerdeşt ji dewama olê Indo-Îrani ye. Li ser vê yekê dirokzanan ditînen xwe kîrîne yek.

## ZERDEŞT Û XEBATA SİYASÎ

Dewletên Madî, Akamênî, Farsî û Sasani di bin tesîra olê Zerdeşt de mabûn. Lê belê, bes Sasaniyan xebateke baş li ser olê Zerdeşt kîrî. Ne dewleta ( împaratoriya) Madî, Akamênî û Farsî olê Zerdeşt ji xwe re ne kîrî olê fermî ( resmî). Gava ku Împaratoriya Rom, olê filehtiyê kîrî olê fermî ji xwe re, Sasaniyan ji dest avêtî Zerdeştîyê. Merov dikare bêje, ku Sasa-

ni mecbûr mabû. Di vê dema diroki de ol û siyaset bûbû yek. Ol bûbû hêzekî madî, ku împaratoriye li ser lîngan dîhêşt û îdeolojiyêke şîrikatî pêk ani. Dijmîni wê çaxê ji hundirê împaratoriye radîbû û dibû hêzeke derve û bêgani. Dewleta Sasani (226-650 Piştî Miladê), cara yekemî mecbûr ma, ku nîvisar û gotînen Zerdeşt bîdîni ser hev û pirtûkeke pêk bînin. Ji ber ku olê nê bî pirtûk, qîmeta wî gelek tunebû. Bes bi gotîna dev bû. Mela (mag) ditînen Zerdeşt, dua û îbadetên xwe li ezber dixwendî. Di wexta xwe de Zerdeşt, mela bû. Di nav pêxemberên mezîni de tenê Zerdeşt ji destpêkê mela bû. Ji ber vê yekê jî rola mela di olê Zerdeşt de ciyekî mezîni digre.

Wexta ku Eskenderê Mezîni (Eskenderê Zîlqîrneyn), zora dewleta Farsî bîr, dixwest ku kutureke bi şîrikayeti ji Indo-Îrani û Yewnanîyan pêk bîne. Olê Zerdeşt di vê demê de gelek pêşta çûbû. Eskenderê Mezîni, bajarê Perspolis şewîrand û ji vê yekê jî gelek dokuman û nîvisar wendabûn. Li gor gotînen Avesta wê çaxê li ser çermê 12000 ga bîtipên zer hatîbûn nîvisandî. Û ji ber vê yekê jî wenda nebû. ( mêzeke N.Y. Berg) Di sala 650 (P.M.), dora xerakîrîne hat ser Ereben musîlman. Ereban, zora dewleta Sasani bîrî. Careke dîni hebûn û qîmet rakîrîni şewîrandî. Gorzê lawê Rîstemê Zal wê carê nikarî bû zora ereben musîlman bibe. Bi ereban re dema zordariyê destpêkîr, rê ji melan û ulm-

zanan û hevalbendên Zerdeşt re ne ma. Merov bi darê zorê hatîni musîlmankîrîni û yêni ku musîlmantiyê qebûl nekîrîni bar kîrîni û çûni Hindîstanê. Di dema iro de, nêzîka 200.000 merov li Hindîstanê bawerîya wan bi zerdeştîyê hene.

Ew dema diroki, di diroka mero-vahiyê de gelek dijwar derbas bûbû. Dewletên bi hêz û xwedî hebûnê nûjen her gav bi ser dîketîni. Û dibîni dewlemend. Cîvatên ji aliyên aborî û leşkerî de pêşketî, zora yêni dîni dibîrîni. Bi darê zorê û serê rîmê qedera cîvatan tayîni dîkîr. Diroka Mezopotamya û Asya Bîçûk, diroka avakîrîni û xerakîrîna dewlemendî, sîvîlyatî û pêşketîne ye. Hînekan avakîrîni û hînekan xîrakîrîni û hînekan jî her du tîştan kîriye. Hîni hêz û dewletan, mero-vahî û kutur pêşve bîriye û hînekan jî şewîrandîni û xîrakîrîni. Lê, dirok bi sebr, bi dîlşewatî, bi kul û keser pêşta çûye û heta iro hatiye. Di vî wari de kes nehatiye jî bîrkîrîni. Dijmîni û dostên mîrovahiyê, hevalên pêşketîni, iro baş xwîyani dîkîni. Dewlet û mero-vên barbar û zîlkar iro jî hene û hevalê-mero-vahiyê, jî, bîqabul wan in. Di-roka cîvatên çînayeti wîlo pêşdi-keve û dîherîke.

## AHURA MAZDA Û ANGRE MANYU

Di olê zerdeşt de du hêzên esasî hene, ku li dij hev şer dîkîni. Çerxa cihanê li gor şerê wan her du hê-zan pêşve diçe. Xîrabî û rastî di

dîroka mero-vahiyê de zelal dîbe. Ahura Mazda temsîla rastiyê, başiyê, ronahiyê, jiyanê û mero-vahiyê dîke. Ahura Mazda, xwediyê zanîni û pêşketîni, haqîmê başî û ronahiyê ye. Serdarê Madî û Farsî, Darius û Kyrius mezîni û iqtîdara xwe, bi daxwaza Ahura Mazda ve gîrdan. Bi vî awahî îdeolojiya teokrasi û iqtîdara siyasî, tesîr li hev dîkîr. Li bajarê Persopolîs, li ser nexşê-Rustem, Darius wîha dibêje: " Ahura Mazda bike, vî welatî jî êrişên dijminan, bîrçîbûn û jî derewan bîparêz e! ne êrişên dijminan, ne bîrçîbûn, ne jî derew ne yê ser vî welatî." ( N.Y. Berg) Sebebên ku Darius, ji hêla Ahura Mazda da layîqê serdariyê hatîni ev in:

Darius ne xerab û ne derew bû, ne barbar û zîlkar bû. Li hîmber başan nerm, li hîmber xîraban dijwar bû. Darius, siyaseta xwe bi alîkari û şîrikatiya Ahura Mazda ve îzah dîkîr.

Li hîmber Ahura Mazda, remza başî û rastiyê, dijminê derewan û tarîtiyê Angre Manyu heye. Mîrov dikare bêje, agrê manco, ji ber ku di nav gelê Kurdistânê de iro jî gotîna û tîrsa agrê manco, yan jî gurê manco heye. Gurê manco temsîlê xîrabî, tarîti, nexweşî, bîrçîbûn, stû-xwarî û derewa ye. Li her aliyê cihanê, di cîvatê de, di axlaq û îdeolojiya mero-van de, ev her du hêz li hember hev şer dîkîni. Tekoşîna wan her du hêzan xwe di wan rîk û bawerîyan de dîde nîşan. başî-xerabî, ronahî-tarîti, mirîni-nebîrîni, jîyandari-nexweşî, dewlemendî-belengazî, rastî-derew, şahîti-şîni ûhw.. Avaniya olê Zerdeşt, li ser du alîtiyê ava bûye. Di merhela dawî de ew dê du alîti rabe û başî-ronahî zora xerabî-rarîtiyê bibe! Derew dê jî nav mero-van rabîni û mero-v dîlşah bîjin. Ji bo Zerdeşt, rastî baş e, derew jî xîrab e! Merov di kare bêje, ku iro jî weha ye. Gotînen beriya 3000-4000 sal hatîni gotîni, iro jî aktuel in. Em guh bîdîni Zer-deşt:

" Merov, bi iradeke serbîxwe jî bo xerabî û başiyê jî hev ciyê bike, hatiye cihanê. Kîrîna mero-van, hemû fikir û tîştên ku kîriye û gotîye, li

pirtûka vi ya jiyane tê nvisandin. Fikrê baş, gotin û kîrînen baş li aliki, fikrê xerab, gotin û kîrînen xerab li aliki tê nvisandin û qeyd kirin. Wexta ku merov dîmre, ruxê merovan derdike mîqabil merov û di Pirtûka jiyana xwe de hesap dide. Heger fikrê baş, gotin û kîrînen baş, ji yê xerab zêdetir be merov diçe bihiştê (cennetê), na, heger xerabi zêde be, merov diçe cejnemê." (Bûyûk Dinler s. 99)

Her kes ji kîrîn û ditînen xwe berpirsiyar e û kes nikare bibe wekilê kesê. Merov bi hev re ne, lê her kes berpirsiyarê xwe ye. Berpirsiyariya kesî di felsefe û olê Zerdeşt de, ciyê ke mezîn û giring digre.

## ZEND-AVESTA

Avesta, ji stranên Gatha pêkê. Zerdeşt, bi xwe wan nvisandiyê. Ditin û baweriya Zerdeşt, bi kurtî di van stranên de heye. Avesta, tê mana zanyariyê. Xusrev, hemû nîvis û gotînen ku li ser Avesta hatî bûn gotin û nvisandin, da serhev û kîre pirtûk. Wexta ku musilmanti li cihanê belav bû, gelek zîlm li netewên bê kîteb hat kirin. Li AHL-AI kîteb, yani li xwediyê kîteban zêde zîlm û zordari ne dahat kirin. Musilman û fileh xwdî kîteb bûn ji ber ku olê Zerdeşt bi dev dahat gotin, Erban navên wan kîrbû zam-zama. Merov dikare, bê guman bibêje, ku Zerdeştîyan pirtûka xwe nîvisin, ji bo ku ji zîlm û zordariya ereban rîzgar bibin. Pirtûka Avesta ku heta iro hatiye, ji aliyê Sasaniyan ve B.M. 560 an de hatî bû nvisandin.

Beriya ku Avesta bêt nvisandin naveroka wi ji, ji qîrnan derbasi qîrnan bûye, hatiye belavkirin, xwendin û propaganda kirin. Û ji ber vê yekê ji, merov nikare bêguman û baweri bête, ku Avesta roja iro ku heye, tenê ditin û gotînen Zerdeşt in. Lê, baweri û remanên Zerdeşt gelek tişt lê hatine zêdekirin, an ji, jê hatiye derxistin. Pirtûka ku Sasaniyan pêkani, bi rasti pirtûkeke kolektîf e, gelek mela, ulmdar, serdar û imparatoran alikariya pêk

anina pirtûkê kirine. Piştî xebata kûr û dûr, Avesta şekle xwe yê dawî girt û bû Zend-Avesta.

## EXLAQÊ ZERDEŞT

Li gor rewşa diroki, exlaqê Zerdeşt, di dema xwe de, aştiwxaz û pêşkerti bû. Di vê dema diroki de hemû dewlet û eşiran, mir û mirokan li humber hev şer dikirin. Zîlm û zordari bûbû jiyana rojane. Merovên belengaz û jar di bin lîngan diçû.

Di demeke wisa de, Zerdeşt Exlaqê ideolojiya xwe pêk ani. Merov divê di jiyana xwe de hevalê rastiye be! Li humber merovan nerm û dost be, alikar û mêvanperwer be. Merovê Zerdeştî, pêwest e, li humber xirabiyê, derew û zordariyê tekoşin bide. Dev ji tişt û kîrînen xerabi û nebaşiyê berde û bide ser riya baş û rastiye. Divê merov ji jiyane hez bike û zarokan çêke, pez û dewaran xwdî bike, çandî û cokyariyê li pêş xine. Merovê zerdeştî, divê di her wari de pişgurtiya avakirîne bike û li humber xirakirîne raweste. Zerdeşt, wiha dibêje.

"Di ditin, kîrîn û gotînen xwe de merov divê paqj be. Xwediyê merhemet û alikariyê be. Axê bajo û daran bibre, bezû-dewaran xwedi bike. Li teba û heywanan xwedi derkeve û karûbarên baş bike." (Buyuk Dinler s. 99)

Zerdeşt, di navbeyna merovan de dostani û evintiyê diparêze. Dost ew e, ku destên xwe dirêjên dostan dîke. Çaxa başi zora xirabiyê dibe, di navbera mirovan de dostani pêk tê. Di dostaniyê de başi zora xirabiyê dibe. Zerdeşt, di olperesti û ideolojiya xwe de ferq naxe navbera jin û mêran. Zerdeşt, hevalê jiyaneke aktif û bi mane ye. Li humber neheqiyê ye. Zerdeşt wiha dibêje:

"Ez Zerdeşt, pêxember, her dem hevalê edaletê me." (Büyük dinler s. 105)

## DAWÎ

Di despêka nîvisarê de min got, ku, Baş bifikire, rind bibêje û çen-

ciyê bike! Filozfê mezîn Fredrik Nietzsche li ser Zerdeşt pirtûkek nvisandiyê. Navê pirtûkê, "Zerdeşt Wiha Dibêje." Lê, mixabin Nietzsche ci ne daye ditin û ideolojiya Zerdeşt. Lê belê ji xwe re ideolojiyek nû pêk aniye. Elaqa ideolojiya Nietzsche û Zerdeşt çet bi hev nin e.

Zerdeşt, dibêje, ku destên xwe bide dostan û li humber neyaran be! Hevalê rastiye û dijminê derewan be! Ez, bawer im, ku merovahiya heta roja iro guh bîdana Zerdeşt, ew dê cihana me ne di rewşa iro de bûya... Em Kurd ji, divê guh bîdan ser gotînen Zerdeşt û hnek dersan jê derxin. Em, baş bifikirin, ku em dê çawa gelê xwe ji bin destên kolonyalîstan derxin. Em dê rind bêjin, ku ji bo gelê me, guh bide me. Û divê em di karûbarên xwe de bîbin minak, ku em civateke serbi-xwe, azad û merovahiye avabikin.

## ÇAVKANI

- 1- Irans Frontda Religioner- H.S. Nyberg. Uppsala 1937
- 2- Buyuk Dinler Ansiklopedisi
- 3- Var Tids Religioner. Geoffrey Parinder- Sthk 1974
- 4- Religion Historia- Olof Petersson Lund- 1983
- 5- Vardens Religioner Sthk 1983
- 6- Avesta- Pirtûka Himmel û Helvete Uppsala 1977

## DAXWUYANIYEK

Xwendevanên hêja!

Nîvisarên Berbangê, hnek bi "i-î" û hnek ji bi "i-i" tînen nvisandin. Ev problem ji destpêka Berbangê ve heta iro dom dîke. Lê, wiha xwuya ye, ku ev yek dê hin demeke dûr û dirêj bigre. Nîvisarên ku ji me re tînen; em her nîvisarê, li gor orjînalê wê dinvisînin û diweşînin. Û her wiha Berbang, bi du alfaban tînen nvisandin. Ji ber vê yekê ji xwendevanên me gelek zehmeti dikşînin. Divê xwendevan di vê wari de li me biborin!

# JÎ KURDISTANÊ NÛÇE Û BÛYER

## TURGUT ÖZAL LI KURDISTANÊ HIMÊ 50 GIRTİGEHAN AVÊT

Serokwezirê Dewleta Tirk a koloniyalist û faşist Turgut Özal, dema karina (hukumeta) xwe sazkr, dı bernama xwe ya xebatê de jı bo pêşveçûn û şênkirina Tirkîyê çend "hedefên mezin û giring" da diyarkırın. Xweza, avayi û şênkirina herema Kurdistanê jı dı nav wan "hedefên" serokwezir de rêza 5 an digirtın(!) Turgut Özal, dı butça xwe ya 1985 an de jı, jı bo wê "hedefa 5 an" 250 milyar lira veçtan-dibû. Ev pere jı %5 ê butça Turgut digirtın. (butça Tirkîyê beşa hedefan)

Serokwezirê Tirkîyê Turgut Özal, her ku diçûn here ma Kurdistanê an jı ku carnana dı radyo û televizyonê de fersend diditın; dest bı fort û propaganda "hedefa 5 an" dikırın:

"Em, dê bı vê projeyên "hedefa 5 an" Rojhilat (Kurdistanê) jı paşvemayiyê û xızaniyê rızgar bıkın vê herema Rojhilat, bı industri û çandiya nûjen (modern) pêşve bın. Dı demeke pır nêz de ferqa nabeyna herema Rojhilat û Rojava (Kurdistan û Tirkîyê) nemine."

Lê, rast bû, dı demeke pır km de rojnamevanên koloniyalistên nijadperest bı xwe "hedefa 5 an" û projeyên Turgut Özal, eşkere kırın. Gotineke pêşiyana heye; "Jı kurmê dar ne be, zewala dar nin e." Belê rojnamevanên Turgut yêni canı mani bı xwe, hemû pil û kırınên Turgut Özal, derxistin rastê Ka gelê, ew "hedefa 5 an û projeyên" Mirza Turgut çı bûn?

Dı "hedefa 5 an" û projeyên" Turgut de, lı herema Kurdistanê, avakırina 50 girtigeh (zindan û hepsixane) avakırın û çekırina qereqol, malên serleşker, wali û qeymeqaman derket holê. Heta iro lı 50 girtigehan 4 milyar û 800 milyon

hatiye xerckırın. Milyarek jı lı qereqolên leşkeri hatiye xerckırın. Bı yê mayi jı, jı wali, serleşker û qeymeqaman re qesr û vilan çekırıye û çêdike. Beşek jı vi pereyi jı, lı riyên gundan mesref kırıye, ku leşkerê komando bı hêsa herın gundan û lı gundiyan Kurd eşkence û lédanê zêde bıkın.

Belê, "hedefa 5 an" û "projên" Mirza Turgut ev bûn. Lı gor rojnamevanên Tirk jı, êdi Turgut nıkare lı wê hereme bigere û derewan bıke. Her ciye ku ew diçe, gel wi rûş û derewçın derdixe. Faşist û koloniyalist, jı xwe lı her derê dınê vi kari dikın. Kuştın, girtın, zindan kırın, lédan û xwinvexwarın qereqoterê wan in. Wek hemû gelên dinyayê, dê gelê Kurd jı dır-nêzik van koloniyalist û faşistan dı van girtigehên tawanbar (ceza) bıke!

## ARMANCA CUNTAYÊ CIVAKEKE CAŞ Û NOKER PÊK BINE

Jı 5 salan vır de ye, ku cunta faşist a Tirk, dıke nake, bı êriş û Operasyonên xwe yêni hov û xwinrij nıkare berxwedana gelê Kurd bide rawestandın. Dı bin mercên koloniyalizmê û faşizmê de disa berxwedan her ku diçe, zêde û xurt dibe. Jı vê rastiya berçav tirs û lerz ketıye laşê cuntayê. Jı bo ku vê berxwedana serfiraz bide pelçiqandın û belavkırın, bı êriş û operasyonên xwe tenê naçe ser gelê Kurd. Cunta dı vi wari de jı, metodên cûrbe cûr bı kar tıne. Dı nav gel de noker, caş û xwefiroşan pêda dıke û çêdike. Dıkire. Û teknika nûjen (modern) û gengaziyên (imkanên) mezin û fireh dıxe xızmeta wan kesên xwefiroş.

Bı salan in, ku cunta faşist lı herema Kurdistanê kesên xwefiroş, dı perwerdekariya çekdari de

derbas dıke. Dı dawıya perwerdekariya leşkeri de çekên nûjen, lı wan kesên xwefiroş belav dıke. Riya gundan çêdike û piraniya dibistanên gundan dıke qaragahên leşkeri. Iro cuntayê, jı 2/3 ordiya Tirk kışandıye nav axa (xaka) Kurdistanê. Hênû memûr û keyayên (muxtarên) gund û navçan (qezan) xızıtiye xızmeta leşkeriyê. Cunta faşist, nıha jı her keyayek 140 hezar lırayê Tirk digre û lı humber wê 140 hezari, telsizeke "Condord AG-007" dıde wan. Pêwist e, keya her dem gund bigre bin kontrola xwe. Keya, ew kesên ku fikariya wan bıke û bışehibine şoreşgeran, pêwist e, dı ci de bı telsıza xwe, qereqolê agahdar bıke. Cuntayê vê karê nokeriyê keyayan daye hınek kesên dın jı. Armanca û daxwaza cuntayê, dı vi wari de ev e, ku civateke bı şık û noker pêk bıne. Lê cunta faşist xwe dıxapıne. Ev kar jı qereqoterê gelê me re dır e. Lê bê xwefiroş jı nabe. Gelê me noker û xwefiroşan qet nabexşıne. Dıroka Kurdistanê bı van minakan (misalan) tıje ye.



Güneydoğumun  
telsizli köylüleri  
Güney  
lira ka  
çetecik  
amanda  
Telsizi  
elektrik  
telsizle

## CUNTAYÊ 140 HEZAR

## PIRTÛK ŞEWITAND

Serleşkerê bajarê Ankarê çendek berê 140 hezar pirtûk, berhev kir û şewitand. Dema ku cuntayê di 12 ê Itonê 1980 yi de destdabê ser kirdayetiya tirkîyê, bi hezaran kesên sosyalist, pêşverû welatparêz re bêhejmar pirtûk ji, berhev kiribû. Wan pirtûkan çirandin û şewitandî bûn. Serleşkerên cuntayê her kes li herema xwe, heta iro vi karê ha yê li dij zanisti û mirovahiye bêbestan didominin. Ji aliyê din de gelek kesên pêşverû û welatparêz, ji ber tirs û xofa cuntayê, bi hezaran pirtûk, kovar û broşûran xwe bi xwe imha kirin û veşartin. Ji vê rojê heta iro, Tirkîye û beşa Kurdistanê, ji aliyê xwendin û zanisti ve bû zindana nezani û rûşiyê. Zindaneke reş û tari...

Ji xwe li Tirkîyê, ji avabûna Komara Tirkîyê (cumhuriyeta Tirkîyê) heta iro, bi zumanê Kurdi nîvisandin û xwendin qedexe ye. Ev qedexebûna zuman, wêje (literatur), çand û pişa (sîn'et) kurdi çet ji navê ranebûye. Di wî wari de hemû hukumetên Tirk yênan ku hatine ser hukum ji rsat heta çep, ji yênan sivil heta yênan leşkeri hemû wek hev fikurine û politikayênan xwe dane domandin. Ev ji dewra Kemal vir de bûye ideoloji û politika dewleta Tirk ya resmi.

Faşîzm û nijadperesti li her derê dinê dijmnê zanisti, mirovahi, aşti, ronahi û azadiyê ye. Divê başbêzanin, ku ew pirtûk, kovar û broşûrên ku cuntayê berhev kir û şewitand, hemû ne yênan sosyalist bûn. Hinek ji wan yênan nîviskarên demokratê Ewropayê bûn; hinek ji yênan Tirkîyê bûn. Di nav wan pirtûkan de beşek ji aliyê Sazgeha Zmanê Tirkî (turkDil Kurumu) ve hatibûn nîvisandin û çapkirin. Wek hinek xwendevanên me pê dizanin, ev Sazgeh ji aliyê Mustafa Kemal ve hatibûn avakirin. Piraniya wan pirtûkan zuman û literatûra Tirkî bûn. Cunta ji wan pirtûkan ji tirsîya. Cuntayê di rojê de 40 kamyon tije pirtûk li Ankara karê şewitand. Li bajarê İstanbulê ji bi hezaran pirtûk berhev kirin û dîkin. Li heremen din ji ev karûbarê dij zanistiyê domdike. Di carekî de cuntayê dest da ser 133.607 heb pirtûkên çapxana Bilim û Sosyalizmê. (Rojname cumhuriyet, 11. 07 85)

Cunta ketiyê nêçira merov û pirtûkan; operasyonan du alî dimeşîne. Lê, karê mêrkujan çî ne?

Cunta ketiyê nêçira merov û pirtûkan; operasyonan du alî dimeşîne. Lê, karê mêrkujan çî ne?

## LI TIRKIYÊ

## PERWERDA NIJADPERESTI

S. QEREC DAX

"— Zarokên delal, hun biçûk in. Evabori ye, bihati ye, Amerika ye dev jivan tîştan berdin! Ev karê we nin e, ku hun serên xwe pê ve bêşinin. Yênan ku bi wan karan re dixebtin hene.

— Zarokno, li cihanê rîya herî heqî û rastîtiyê ya îslamiyê ye. Ez dixwazim ku hun bînan ser vê rê.

— Ji bir nekî zarokno, cihan hin ji, ji tirkînan dîtirse!

— Zarokno, tixubên (sinorên) me gelek fireh bûn, lê me neparast. Dê rojêk bê; em dê disa wan axan paşve bigrin.

— Min ji we re gotî bû ku pirtûk me-xwinin. Hevaleke we çet şerm û heya ne kir, pirtûk kirî bû. Ez difikirim nîzanim çî bêjim. Ew pirtûk yênan xirab in, tînazên (henekên) xwe bi felsefê dîkin."

(Yarin, kovara mehîniya senet-edebiyat, hejmar 47 Tirmeh 85, r. 29)

Belê xwendevanên delal, hun van gotinan şaş naxwinin. Û 50 sal berî ji ne hatine gotin. Ev gotin di meha tirmehê 1985 an de li Tirkîye, li universitê hatiyê gotin. Min van gotinan ji Kovareke tirkî girt û wergeran kurdi.

Van gotinên rîji û pûç, zarokêk 10-15 salî negotiye û meroveke nezan ji ne gotiye. Xwediyê gotinan profereki tirk e. Him ji li universitê xwediyê kursiya ilmê. Serokê Kursiya Felsefa Îslami profesor NİHAT KEKLİK e.

Peyva profesorê granbiha(!) ya yekemin şanê me dide, ku profesor bi çaveki biçûk li xwendekarê universitê dinêre û wan dîke zarûk. Bê guman em dizanin, ku li Tirkîyê xwendekarên universitê 18— 20 salî ne. Lê profesor wan dîke zarok û şîretan li wan dîke. Profesora dizane, ku di jina Tirkîyê de, dema ciwanîyê ciyeki gelek girîng digre. Disa profesora dizane, ku ciwan jîr, jêhati û têgehîştî ne. Ji çîna burjuvazi hetê çîna karkeran her kes dizane, ku ciwan di tekoşînê de ciyeki girîng digrin. Îro hemû merovên demokrat û welatparêz dizanin ku dewleta Tirkîya kolonyalist, faşîst û nijadperest axa Tirkîyê û Kurdistanê firotnê, dane Amerika yekbûyi. Loma Profesora ji xwendekarên xwe re dibêje: "Evabori ye, bihatiye, Amerika ye; dev ji van tîştan berdin..." Daxwaza

profesora ji ciwanan re ev e:

"Divê hun qebûl bikin, xulamti, stûxwari û bêçareti himi ideolojiya sistema me ye."

Di xala duyemîn de profesora, wek pêxember, wek nûnerê dinê îslamê rîya îslamîyê diparêze. Û ciwanan ji, di wî wari de perwerde dîke. Ez, di derheqê dinê îslamê de dîr û dirêj nîkarrim li vir binivisînim û li ser vê babetê minakan zêde bikim. Ji lew re ev babetê teke serbixwe ye. Ez dixwazim di wî babetê de minakek ji nîviskar M. E. Borzaslan bîdim. M. E. Borzaslan di kovara Jin de wilo dibêje:

"... Dewleta Osmanî ya ku Kurdistanê û gelek welatên din ji sed salan dibin nîrê xwe de hiştibû, wê ji ala dîndariyê dabû ser milê xwe, neheqî û bêrêti û cinayetên xwe gişt di bin perda din de dişopan. Padişahê Osmanî iddia dikir, ku ew xelîfeyê hemî mîslmanan e û bi wî awayî rengêkî dîni dîda selneta xwe. Her wîha Kemal Paşa jî, ku di sala 1919 an de dest bi tevgera xwe kiribû, di destpêkê de bi navê dîn rabû-

bû. Ala " rızgarkırına dinê islamê û xelîfê islamê " dabû ser milê xwe û bîlind kirî bû. Wî, bî navê din û gelek dek û dolabên din û bî gelek dîrûtiyên cûr be cûr gelê kurd jî xapandin. Alikariya Kurdan standin. Paşê li gelê kurd bada û feyîli ser kurdan, qetliamên nebûyi ani serê wan. ( Jin, r.12 )

Jî peyvên profesor ya xala duyemin, bihneke gelek geni, murdar, kevnepereşt, nijadperest tê. Nijadperestiya tirk ne tiştêki nu ye. Ditîneke gelek kevnare ye. Serkaniya nijadperesti ya tirk jî dema Osmani, jî hereka İttihat û Terakki (yekiti û Pêşketin) tê. İttihat û Terakki himi ideolojiya nijadperest avêtine û heta iro, bî navên cûrbe cûr domandinê. Mustafa Kemal merovên rêxistina İttihat û Terakkiyê yê heri mezin û gring bû. Berî elnkırına Komara Tirkîyê — 1923— Kemal paşa di peyvên xwe yem parlamentoyê de û civinên siyasi de bahsa kurdan dikir. Yekiti piştgiri û biratiya gelê tirk, kurd û yên din dikir. Lê piştî avakırına Komara Tirkîyê, fetil û çivan da xwe, hebûna gelê kurd inkar kir. Remanên tirkîti û nijadperesti eşkera kir. Û got li Tirkîyê tenê tirk hene. û Mustafa kemal digot: " Tırkek bedelê cihanê ye, çî bextiyari ye, ku merov tirk be..... "

Wek mirza profesor(!) jî dibêje, sinorên imparatoriya Osmani gelek fireh bûn. Lê çî fêde ew nikarbûn bîparêzin (!) Jî dirokê em dîzanin, ku sinorên İmparatoriya Osmani, jî aliki dehta Yemenê, jî aliki de heta deriyê Viyanê, fireh û dirêj bûn. Ger em jî profesor bîpîrsin, ku çima pêwestiya dagirtina (işgalkırına) wan erdan ditibû, dê ew jî me re bêje; " me, jî bo mirovahiye û aştiyê wan deran girti bûn. Me, medeniyet bir wan deran. "

Profesorê nijadperest dixwaze xwendekarên universitê, jî derî pirtûkên nijadperest û paşverû pirtûkên din qet ne xwinin. Daxwaza profesorê cuntaya faşist ew e, ku bî pirtûkên paşverû û nijadperest serê xwendekaran bîşo. Lê, profesorên Hitler jî van metodan bî kar ne dîanî? Faşizm û nijadperesti dijimnê, zanisti û mirovahiye ne.

Iro li Tirkîyê, faşizmê graniya xwe daye ser universite û dibistanan jî. Cuntayê, li universitan û li dibistanan profesor û mamostên demokrat ne hiştin, hemûyan jî kar avêtin. Di şûna profesor û mamostên demokrat de, jî leşger û sivilên faşist kesan anin û karê mamostetiye û profesoriye dan wan. Bî guhartina mamostan re hemû pirtûk û metaryalên dibistanan jî hatin guhartin. Iro, li Tirkîyê, universite û dibistan bûne axurên faşizmê.

## SERPÊHATIYÊN

### KALO

BAVÊ NAZÊ

Di qontara çiyê de, piştî raki-rina kevirên mezin û nehîtan, lêkirina benê ji wan, danhevdana zuxuran û çêkirina şikêran; piştî birîna devîyan û hunandina sîncan li ser benê; panavek nuh paçjikirî mîna zolekê li bedena çiyê ciyê xwe girti bû. Di vê zolê de xerzîkek du salî şax û baxên xwe bi heritî berdabû. Dihât xwiya kirin miqatiyetî û hustayetiya xwed-yê wî.

Ev tiştên han jî dîr de xwiya dikirin. Dema min nêzîkayî lê kir, min dît kalekî heftê salî, piştixûz, rî sipî û dêmekî miştî çermîçokên bi salan, bi devkî bê diran silava min vegevand.

Kalo bi çavekî kirîne li min temaşe kir. Ez jî bi şal û şapik bûm, rextek li min pêçayî, kolîşnîkovek li milê min bê ku ez xwe bidim nasîn, dihatim naskirin bi pêşmergetî. Kalo piştî nêrina xwe ya tûj û dirêj jî min re got:

—Kurê min xwiya ye ti rêwî yî, te rê şaşkiriye û ji hevalên xwe mayî.

Min bi şanazi û sermezneyî lê vegevand, daku xwe pê re bidim naskirin.

—Ez pêşmerge me û ciyê me jî vira ne dîr e...

Kalo bi çavekî matmayî li min nêri û got:

—Pêşmerge li ser herdû çavên min in. Lê ji bo çî hûn li van deran digerin? —Kalo bê ku bersiva min bibihîze gotin berdewam kir.— wî ças sal ez li vir im, tu carî axa me xwe bênamûs nekir û rifên leşkerên hukûmetê pêlê nekirin.. Ma ge-

lo tu alay û tabûrên wan hatine van dera?

—Na Kalo, niha jî tabûrên leşkerên hukûmatê li vanderana peyda nabin.

—Lê we xêr e kûrê min?

Piştî rawistinek ne dirêj min jê re got:

—Em li "çaşan" digerin.

—Li "çaşan" ? —Kalo gotina min bi pîrsî vegevand.

—Erê Kalo li "çaşan" , ew jî xayinên millet in, tevî ku ew jî bi navê kurdayetî lan dikin.

Kalo cardî bi matmayî li min nêri û piştî mijûlbûnek nêdirêj got:

—Ji kalkê xwe re bêje kurê min, mero çilo we jî hev nastike?

—Bi navan... Heger ew ne ji me bin û şerê me bikin... mana xwe "çaş" in.

Kalo jî min pîrsî:

—Ma ew navê we dikin çî?

Di dilê xwe de min got, "heye tune ye ev kalê han bi "çaşa" re ye, yana çima baweriya xwe bi ya min nayne û peyvê qutnake." Ji bo wilo min bi awirên tûj lê nêri û got:

—Helbet dijmin wê navên pîs li mekin, ji bo ku avê li ser xwe zelal bikin.

Kalo bi dilşewatî pîrsî:

—Kûrê min we gelek ji hev kuştine?

Bê hemdî xwe min serê xwe berda ber xwe û got:

—Gelek...

Kalo bi gotina min re rûnişt, cixare pêça û pêxist, hilmek li ser hilmekê kişand û piştî keserek



bi axîn peyivî:

– Ez nizanîm rast e, lê derew e... lê dibêjin di quranê de heye.. li gora gotinên melan hemû tişt di quranê de heye. Leyse... te çîroka Yûnûs Pêxember bihiytiye?

– Ya ez zanîm pêxemberê tenê heye, navê wî jî Mihemed e.

Kalo di ciyê cîde got:

– Ela hume selî ela Muhemed.. Lê kurê min dibêjin sê sed û şist pêxemberên din hebûn; yek ji wan jî Nebî Yunis bû..

Bêdeng min serê xwe hejand û kalo peyva xwe berdewam kir:

– Ev Nebî Yunis, heft salan di zikê hût di binê dengizê de ma bû.. Piştî heft salan xwedayê alemîn wî avêt devê dengizê rût û tazî. Wî çermê wî tenik bûbû merov hestiyê wî tê re didît. Nebî Yunis gava çavên xwe vekir xortekî çarde salî bi herdu çavan kor dît. Koro destên xwe dipeland ku têkeve ser rîya rast. Nebî Yunis destê xwe bi alî xwedê vekir û got; "ma xwedawo gunehê vî kesî çiyê, ku te ji biçûkayî de wî kor kirîye? Û tê bi qedir û izeta navê xwe ke tê çavên wî sax bikî."

Xwedê teala dua Nebî Yunis bi cî anî. Xortê kor dît xwe nedît ji nişkave herdu çavên wî vebûn. Hema di ciyê cî de rapelikî xwe. Dema çavên wî li Yunis Nebî ketin, kare yek nekir dudu rahîşt jukirên ser devê dengizê û bi tepiza bi Nebîyê Xwedê ket. Laşê Nebî Yunis wiha tenik û nazik bûbû, mîna tiliyê mêtayî, çawa tepik dihatiyê wî jî di laşê wî de diçû xwar.. Nebîyê xwedê tiştik li ber nema xeynî bêje. "Xwedewa ti bi narê xwe zanî.. Heger te nizaniba te ew kor nedikir."

Piştî vir Kalo demeke dirêj bê deng ma, û ez jî mam heyirî çî bêjim. Gelo ji bo çî wî ev çîroka han got. Kalo zik li çavên min nerî û tê derxist ku min meqêda çîroka wî nasnekir. Wî da xwe û rabû ser xwe, wek kesê ku bêje: "Tu here bi rîya xwe de û ez jî karê xwe bikim." Kalo bi rabûna xwe ji min pirsî:

– Ma gelo ti nizanî heger xwedê Kurd bikirana tiştêk ti dilê wê dinya xera nekirna?

Bi vê gotinê bin mebesta Kalo naskir, berê xwe da çiyê, ciyê ku me lusê xwe lê çêkiribû..

Wê şevê xew neket çavên min. Her û her Kalo mîna rew-rewka li ber çavên min diçû û dihat. Gotinên wî li ber guhên min dikirin vin-vin wek pêşîya ku girê xwe firotiye kesê xewxwaz..

Sibehê, bi rojhilatê re min berê xwe da Kalo. Min ew dît mîna dîtina me ji hev re cara pêşî. Dema min nêzikayî lê kir, Kalo pêjna min kir û pê re jî serê xwe rakir. Awirên me li hev ketin.. Nayê bîra min Kalo silava min vegeand, an na, lê xweş tê bîra min, Kalo pêre pêre wek mozqirtkê bi min veda, dema got:

– Kurê min heger ti bê kari.. Kar li cem min tune..

Bi rastî min nizanbû çibkim. Heger ne ew ba, ji xeynî vegeand tû rê li ber min nediman. Lê Kalo mîna ku ji gotina xwe vegere bi tûnek din peyivî:

– Tu xwendevan î? – Bi kurtî ji min pirsî û min ji bi kurtî lê vegeand:

– Erê.  
– Madem wî, pîrsek min heye.  
– Fermo, – Min bersiv da û di dilê xwede got: "Gelo Kalo wê çî bipirse?"

– Ti zanî çima em ji dîkê mirîşka re dibêjin; dîkê kurmançî? Navê wî li hemû derê dik e, lê li cem me kurda "dîkê Kurmançî" ye. Çima gelo?

Bi rastî di dilê xwe de ez bi Kalo kenîyam. Bê yî ku mebesta wî zanibim, min lê vegeand:

– Na, Kalo ez nizanîm. Lê çî elêq xwendina min bi dîkê mirîşka heye?

Kalo disa bi awirên bêbawerî li min nerî. Bi alî min ve hat û rûnişt. Bi rûniştina xwe re da xwiyankirin, ku ez jî rûnim. Wî destê xwe avêt kîsê tûtînê.. Min rê nedayê, ku cixara xwe bipêçe, lewra cixara pêçayî min da dest û pê re jî agir li ber pêxist; da ku cixa-

ra xwe pêxe.. Kalo mîna cara berê hilmek ji dil kişand.. Dû di qulên bêvil û devê xwe re berda. Û du re peyivî:

– Kurê min elêq xwendinê bi her tiştî heye. Kesê xwendevan di vê her tiştî zanibe... Yan na çî ferqa min û te heye? – Kalo li dora xwe temeşe kir û awirên wî li ser asîman man û sekînî. Lê dom ne kir, berê xwe da min û got: Heger tu gundiya dibe, ku te dîtiye çilo dîkê elokan û yê mirîşkan pevdîçin.

Min lê vegeand:

– Ma gelo kî ji Kurdan ne gundî bû?

– Baş e, tevî wî jî hinin hene, ku gundayetiya xwe ji bîr nekirine.. Ne dîr e tî jî ji wan yekan bî – Min serê xwe bi "erê" hejand, Kalo berdewam kir: Heger ti dîna xwe bide pevçûna dîkê mirîşkan bi dîkê elokan re tê bibinî, ku dîkê mirîşka erê bi çelafetê xwe biçûkin, lê zora dîkê elokan ên bi çelafet dibin.. Ne tenê wî, yek zora çend heban ji dibe. Lewra dîkê elokan alî hev dikin.. Û belengazê dîkê kurmançî bi tena xwe şer dike. Bi rastî ti zanî – Kalo dengê xwe hin bêtir bilind kir û got – Dîkên elokan ên li wir tî alî hevalên xwe, lê dîkên kurmançî hiç dîna xwe nadin ser hevalê xwe.. Û feqîro ji bêneçarî direve, çimkî nikare li hemberî wan bi tena xwe bisekine. Erê bira jî dîkê kurmançî çiqasî mîrxase jî, lê nikare bi tena xwe piştî dijmin bişkîne... Ma ne heq bû, ku navê wî bi navê Kurmanca ve hat giredan?!

Bê pêjin ez rabûm ser xwe û hêdî hêdî min berê xwe da çiyê.. Piştî ku ez texnekî çûm min li dû xwe nerî, min dît Kalo bi pişt xuzî karê xwe berdewam dike di nav xerzikê nuh-hatî.. Erê ez çûm ciyê lusê me, lê pişt re devê tîvinga min ne kete singa tu kurdî.

# DEWLETA POLIS

X. Entaxi

Cunta faşist a Tirk, ji bo zêdekirina vatîni û berpirsiyariya (wezîfe û selahiyeta) polis zagoneke nû derxist. Ev zagona polis a nû vatîni û berpirsiyariyên herî mezin û bê sinor da polisê Tirk. Ev zagon wîha bê sinor e, ku polis kare mirov bujke. Yek nîkare ji polis hesap ji pîrske.

Serok Komarê Tirkîyê Kenan Evrenê faşist, ji hêla vatîni û zêdebûnê de niha di cihanê de yekemin tê. Vatîni û berpirsiyariyên diktatorê faşist ji yê Pinoşetê Şiliyê û gelek kralên Rojhûlata—Navin jî zêdetir e. Franko û Salazar di warê vatîni û berpirsiyari de, di sîya Evrenê faşist de dimînin.

Bê guman polisê Dewleta Tirk a faşist jî, dê li gor vatîni û berpirsiyariyên diktator Evren û zagona wî ya himî (Anayasa) şiklekê nû bigirtana. Ji bo parastin û domandina Sazûmana faşist, ev zagona polis mecbûrî tê derxistin.

Ev zagona, vatîni û berpirsiyariyên polis yê nû, ji bo tekoşîna gelên Tirk û Kurd bîdîm rawestandî û belav bîkîm derxistin. Ji lew re li Tirkîyê û li Kurdistanê tekoşîna gelan roj bi roj xurt dibe û li dij cuntayê dijwar dibe. Cunta dixwaze vê tekoşîna han bi barbariyê û bi zordariyê bide rawestandî.

Ev zagona ji bo vatîni û berpirsiyariyên polisên Tirk, di eslê xwe de, ji bo tîjekirina valahiyên zagon yê berê ne. Cunta faşist berê zagona Himî (Anayasa), piştî wê zagona parastina dadgeha dewletê (DGM) û li dû wê jî, zagona awerte (urfi idare) derxist bûn. Û bû çend sal in, ku wan zagonên faşist û nijadperest û kevneperest dicerbine. Lê, cunta faşist ji bo pelçandî û pelşandîna tekoşîna gelên Kurd û Tirk wan zagonan bi tîr û kêr ne dit. Ji ber vê yekê pêwestiya zagonên nû dit. Zagona vatîni û berpirsiyariya polis ji nû ve derxist. Ji aliyê din de bû çend sal in ku iqtidar di destên ordiya Tirk de ye û ordi di çavê gel de gelek reş bû û roj bi roj bê hurmet dibe û gel jê nefret dike. Ji ber van sedeman cunta dixwaze xwe paşve bîkşîne û ciyê xwe bide polis û ku çavên gelan pê girêbide û wan disa çend salan bixapîne.

Li gor vê zagona polis, wek yê Kenan Evren Vatîni û berpirsiyariyên polisê Tirk jî bê hed û bê sinor in. Polisê dewleta faşist, bê bîyara hakûm û mahkemê, çî wextê bixwaze dikare mirov bigre û bibe û eşkencan pê bike. U dikare ew kesên ku bigre hefta 15 rojan di qereqolên xwe de bê deng û bê hes wan di bin lêdan û kotekan de derbas bike. Li gor zagona nû ya polis, polis kare bê bîyarên dadgehê (mahkemê) bikeve mala her kesî û li hember her kesî jî silah bixebitîne. Polis dikare komelan (ji xwe komelên demokratîk û pêşverû qedexe ne), tiyatroyan û sendikan (sendiqên zer jî) bê bîyara mahkemê bigre. Telefonan guhdari dike û naman dixwîne.

Bê şik û bê guman piraniya van zagonan berê jî, ji bo gelê Kurd û şoreşgerên din, her tum di jîyanê de bû. Polisê dewleta Tirk vê xebatê berî van zagonan jî kengê bixwestan pêk anîna wan zor û çetin ne bûn. Ew dem jî car caran kes nikari bû ji polis hesap pîrske. Lê niha şiklekî resmî dan zagonê. Lê divê neye ji bîrkîm, ku ev zagona han ji bo gelê me, her tum û tum fermî bû. Di dewra bavê demokrasiyê, mêrê

mêran Ecevit de ji wîha bû (!) Di sala 1974 an de, di dema serokwezîriya Ecevit de, 20 gundiye Kurd li Wêranşehrê ji aliyê leşkerên kolonyalist ve ne hatin kuştinê? Çi bû? Her dem ji bo gelê Kurd polis û çawişek, xwedî vatîniyên Serokkomara Tirkîyê û mehkema wê ya herî mezin û bilind in. Diroka Kurdistanê bi wan minakan tije ye. Hewceyê gotin û drêjkirî nîn e.

Li gor nivîsandîna rojnamên burjuvaziyên Tirkan. di pişt qebûlkirina zagona polis a nû de, çend grup polis ji Tirkîyê şandin Amerika Yekbûyî û Elmanya Federal. Ew grûbên polîsan, dê li wan welatan hindekari û perwerdekarîya teknîkî (navê eşkence û lêdanê danîne teknîkî) bibînin. Dewleta Tirk di van mehên bori de, ji wan dewletên Rojava ji bo polis gelek makîne û alet stendî. Polisên faşist nikarin û nîzayî van aletên eşkence û lêdanan bi kar bin. Wan polisên ku şandîna Amerika Yekbûyî û Elmanya Federal, dê fêrê bi karanîna alet û makînen nû bibî.

Disa bi derxistina zagona polis re, ji bo tîkîzkirî û hêzkirîna polis, ji butça dewletê pereki gelek mezin veqetandî. Ji polis re Panzer û helikpteran stendî. Li bajar û navçên Kurdistanê, qereqol û sarayên polîsan çêdîkî. Hejmara polîs qat bi qat zêdekirî û dîkî. Kesên faşist û nijadperest ji nû ve digrin nav refên polîsan...

Çawa zagona polis a nû li Enqerê (Ankarayê) hat qebûlkirî, pê re polis, di tevayîya Kurdistanê û Tirkîyê de dest bi operasyonên mezin, fireh û hov û har kir. Bi hezaran kes girtî û wan di bin eşkence û lêdanên ne diti ne derbas kirî. U dîkî. Bi taybetî li Kurdistanê, polis har bû. Ket êriş û alarmê. Li bajarên Diyarbekirê û Cebexçûrê (Bingolê) li nav sîkê (çarsiyê) li her çavên her kesî derketin nêçira Kurdan. Sê (3) kesî di nav sîkê de gulebaran kirî û kuştî. Çaxa dilê polis dixwaze, şev-roj nabêje bi carekî de davêje ser taxeke. Bi saetan li wê taxê çûndî û hatîne qedexê dike. Bi dehan kes di bin eşkence û kotekan de derbas dike û yê nû ku bixwaze digre û dibe qereqolê. Gel çavtirsî dike. Bi panik û psikolojîk dixwaze gel bitirsîne.

Her ku diçe ci li cuntayê teng dibe û cunta jî dest bi metodên cûrbe cûr dike. Niha jî, bi wesîta polis, memûr û muxtarên taxan dixwaze hejmara hemû kesan tespît bike. Ne bi tenê hejmar, ci û kar jî... Disa bi alîkariya wan kes û mûessesan, li hemû welatîyan forman (kaxîzên pîrsan) belav dike. Di van kaxîzan de gelek pîrs hene. Ji xeynê nav û navnîşanan, ki çî ye, çî karî dike, ditîna wî/wê çî ye, hevalên wî/wê kîne û ji malbata wan şoreşger hene an, na ûhw.... Ev agahdari hemû teslîmê polis dibî. Ew çax polis kare hêsa her kesî baş kontrol bike. Lê Perwerdekarî û hindekariya Emerîka wîlo fikiyê xwe dide!.. Lê, cunta xwe dixapîne; Emerîka nikari bû bi metod û teknîka xwe tekoşîna gelên Vietnamê, Îranê ûhw .. din bide rawestandî. Tekoşîna gelan a bi bir û bawerî gelek metod û teknîkên diktatoran û ya Emerîka çirandîye û şikandîye. Dê dîr-nêz li Kurdistanê û li Tirkîyê ji ew bûyer bê serên wan.

# JÎ FEDERASYON Û KOMELÊN

## ENDAM NÛÇE Û ŞIROVE

### KONGRA KOMELA JINÊN KURDISTANÊ PEKTÊ

Jinên Kurd yê ku li bajarên Stockholmê û Uppsalê dijin, bi mehan in, ku xebata sazkirina komela jinên Kurdistanê dikin. Ji bo vi karûbari, çend meh berê komiteke amadekar hatî bû danin. Komiteya amadekar ji zû ve tevdi kongrê dîke. Komite, destûrek çêkir û raberê jinên Kurd kir. Li gor agahdariya Komita Amadekar, xebat gelek pêşve çûye. Jinên Kurd dê di roja 7 ê Îlonê 1985 an de li bajarê Stockholmê li lokala Akalatrêff, saet di 12 an de kongra xwe ya yekemin pêkbinin. Komita Amadekar, hemû jinên Kurd yê ku li Swêdê dijin vedixwine kongrê.

Em Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê jî, ji Kongra jinên Kurdistanê re serketin û serfirazi dixwazin!

### KOMELA ÇAND A KURD LI BOT- KYRKA BI ENDAMÊN XWE RE ŞEVEKÎ GALEGALÎ Û ŞAYÎ ÇÊKIR

Komela Çand a Kurd li Botkyrka, di roja 27.07.1985 an de bi endamên xwe re, civineke bi galegal û kêf û şayi çêkir. Civin, ji derê endamên komelê, ji Kurdên taxên dîm re jî vekiri bû. Programa civinê gelek dirêj û dewlemend bû. Program wiha bû:

\* Raberizin li ser gelşên civaki û kulture yê Kurdên ku li belediya (komina) Botkyrkayê dijin;

- \* Ji Kuristana Iraq û Iranê filim;
- \* Hozan û dengbêjên Kurd distrin;
- \* Bi dawil û zirne govenda kurdi;
- \* Li endam û mêvanan Berbang hat belavkirin.

### FEDERASYONÊ BI KOMITA NÛNERAN RE CIVINA XWE YA YEKEMIN ÇÊKIR

Li ser banga Komita Karger a Federasyonê, Komita Nûnerên Komelên endamên Federasyonê di roja 21.07. 1985 an de li taxa Tenstayê civina xwe ya yekemin pêkani. Piraniya nûnerên komelan bi Komita Karger a Federasyonê re civiya.

Komita Karger a Federasyonê di derheqê bernama xwe ya karûbar de nûnerên komelên endam agahdar kir. Komita me ya karger, ji bo xebata pêş, ditin û pêşniyariyên xwe ji nûnerên komelan re pêşkeş kir. Nûnerên komelan jî, ditin û pêşniyariyên xwe, ji Komita Karger a Federasyonê re diyar kirin.

### KOMITA HEZIRIYA 12 Ê ÎLONÊ

Cunta Tirk a faşist di 12 ê Îlonê 1980 yi de dest da bû ser iqtidara Tirkîyê. Cunta isal di 12 ê Îlonê de 5 saliya xwe tişê dîke. Li welat û bi taybeti li derê welat dê hatin û kirmên cunta faşist bête protesto kirin.

Li Swêdê jî, her sal karûbarên protestokirina cuntayê, bi pêşengi û bi insiyatifa Federasyona Komelên Kurdistanê pêk dahat. Isal jî, ji komita karger, ji bo meşandina karûbarên protestokirina salvegera cuntayê, komita karger a Federasyonê vatini (wezife) da 2 endamên xwe. Ev her du berpirsiyarên Federasyonê, bi hemû komele, hêz û kesên demokrat

û anti-faşistên Kurd, Tirk, Suryani û yê din re têkili danin û di nav xwe de komiteke pêk anin. Komitê, ji xwe re bernama xebatê çêkir û wê dimeşine. Li gor agahdariya komitê, dê di 7 ê meha Îlonê de şeveke çêbe û di roja 12 ê Îlonê, saet di 18 an de jî, li Stockholmê li Sergel Torgê mîtingek pêk bê. Û paşê jî, ber bi Balyozxana (konso-

loxana) Tirkan meşek destpêke. Û li ba Balyozxanê bi axaftin û sloganan cunta bête protestokirin. Em dê di hejmarê xwe ya 5 an de di derheqê van bûyeran de agahdariyên dîr û dirêj bidin.

### HILBIJARTINA ISALI

Ji ne wek hev in. Man wê ev e, ku gava ku civakê n biyaniyan ji welateki din û ji kultureke din werin, hey ku em li pêş xwe minakên (nimûne) din ji hilbijartinan derxin. Piraniya biyaniyan karên fabrika dîxwazin. Ji ber ku biyani bête tîr dandê xwe didin cihê ku ew li wêderê kar dîkin û pê ve grêdayi ne. Ditinên Tomas Hammar ev in, ku dengdayin bi civakê n biyani yê nuh re bête guhartin.

### BULTENA FEDERASYONÊ DERDIKEVE

Komita Karger a Federasyonê, di roja 21.07.1985 an de, bi Komita Nûnerên Komelan re civina xwe ya yekemin çêkir. Nûnerên komelan ji Komita Karger a Federasyonê re pêşniyariyek anin, ku Federasyon di 3 mehan de carek bi zimanê swêdi bulteneke agahdariyê (informasyonê) derxe û belav bike. Komita Karger a Federasyonê vê pêşniyariya ha ani civina xwe ya hefteyî. Komita me pêşniyariyê di ci de dit û pejrand. Biryara Komita Karger a Federasyonê hat redaksiyona Berbangê. Redaksiyona Berbangê jî, biryarê baş dit û dest bi plana xebata wê kir. Li gor plana redaksiyone heta kongra federasyonê dê 2 hejmar bulten derkeve.

## belavoka komita koordine

*Geli xwendevanên delal!*

*Wek hinek xwendevanên me ji pê dîzanin, ku di kongra me ya awerte (15-16 Haziranê) de kongrê, ji bo guhartina sistema federasyonê bryareke nû girtî bû: Duwê sistema federasyonê ji bini ve bihatan guhartin û komeleyên li kominan (li belediyân) ava bîban. Ji bo vi karubari jî, kongrê, ji 5 kesan komisyoneke Koordine hûbîjart. Ev Komisyona ha, dê ji derê Komita Karger a Federasyonê, li ser avakirina komeleyên li kominan lekolîn çê-bikra, imkanaan pêk bahaniya û xebata xwe bimeşandana.*

*Ev komisyona Koordine, dest bi xebat xwe kir. Berê ji xwe re bernameke xebatê çêkir. Û li gor bernama xwe dest bi kar û xebatê kir. Komisyonek, heta niha li hinek ciyan cîvan pêkani û tekûliyan geş kir. Di vi wari de belavoka xwe ya yekemin belav kir. Em li jêr vê belavoka Komisyona Koordine rabere we dikin.*

BERBANG

### JI HEMÛ KURDÊN WELATPERWER, DEMOKRAT Û PEŞVERÛ RE

Ji ber êriş û mêtîniya ku li welatê me dom dike û roj bi roj zêde dibe, bêtirê niv milyonê insanên me mecbûr mane li dervê welat bîjin. Piraniya wan li welatên Ewropa dijîn. Gava mirov sêviya civatên Welatên Ewropa bi civata Kurdistanê rûber bike, astengên insanên me, ku ji ber sedemên abori û siyasi hatine van welatan, xweş tê fêm kirin.

Her ûsa diyar e, ku em xwediyê potansiyeleke grîng in, ji bo em karibin piştgiriya gelê kurdê mîrxas bikin. Lê, ji bo ku em karibin hum pirsên kurdên li dervê welat a civaki hal bikin, hum ji vi potansiyelê grîng bihênin tekoşina gelê kurd, rêxirtiniyeke xurt divê.

Federasyone me, Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê, di kongra xwe ya dawî de (8,9-15-16 ê Heziranê 1985) ev pîrsa raberzand û biryar girt weki li Swêdê rexistîniya Federasyonê xurtir bike. Kongrê diyar kir, ku Federasyon bi vê şêklê rîxistîni nîkare pirsên kurdên li Swêdê a civaki hal bike û wana di bin baskên xwe de bicivine. Loma jî biryar stand, ku di belediyên ku kurd têde gelek in, kurd bi hev re komelan saz bikin. Li gor vê biryarê, kongra Federasyonê ya bê, dê ji nûnerên komelên nû pêk bê.

Kongrê, komisyonek ji 5 kesan hûbîjart ji bo, ku vê karûbarê grîng koordine bike. Komisyon dê belediyên ku kurd têda dijîn, tespît bike û ger şert hebin, dê alîkari bike, ku kurd bînin cem hev û komeleke saz bikin. Komisyona me dest bi karûbarê xwe kiriyê. Di vê demê de karûbarê me, ji dan û sandîne pêk tê. Di destpêka payzê de em dê di belediyân de dest bi civinan bikin. Di van civinan de, em dê pirsên xwe bi hev re raberzînin û karûbarê xwe bi hev re bimeşînin.

Bê şik komisyoneke ji 5 kesan di kareki ûsa fireh û grîng de bi tenê nîkare bi serkeve. Em, hewceyê alîkariya hemû kurdên welatperwer, demokrat û pêşverû ne. Divê hemû kurdên welatperwer, demokrat û pêşverû piştgiriya vi karê grîng bikin. Her kurdê welatperwer, ku dixwaze di vi kari de ci bigre, divê dan û standina xwe bi komisyone re dayne.

JI BO FEDERASYONEKE HÎN BI HÊZ!

KOMISYONA KOORDINE

ADRE:

C/O KURDISKA RIKSFÖRBUNDET  
RÏSSNELEDEN 55 NB  
172 44 SUNDBYBERG / STOCKHOLM

# HILBIJARTINA ÎSALÎ

Ma dê beşdarbûna hilbijartîne da-  
keve jêr?

Carek dîn hilbijartin— Ev hilbi-  
jartina çaran e, ku welatîyên biyani  
ji 1976 an ve mafê dengdanê di  
şehredari û encûmeniya bajêr de  
bî kar tînin.

Em hêvidar bûn, ku beşdarbûna  
hilbijartîne daneketiba jêr; lê, ew  
ji %60 ( di 1982 an de, sala yekemin  
daketa dora %52 ya.

Doçentê Navenda lêkolina Biyani-  
yan ya di Danîşgeha Stockholmê  
Tomas Hammar dibêje, " gava ku  
li parlamentoyê çareserek ji mafê  
dengdanê re neye ditin; xetere  
heye, ku ev daketina dengdanê  
hin berdewam bike."

Bî tevayi imkanek heye ; ew ji  
dayina mafê du welatîyan e.

Tomas Hammar, li ser lêkolînek  
dixebitîya. Ew xebata wi ji, li ser ma-  
fê biyaniyan û swêdê yê n ku li derê  
Swêd in ; dê çawa mafê dengdanê  
bigirtana. Di 1983 yan de pêşni-  
yariya komita mafê dengdanê ew  
bû, ku di dengdanê de ew kesên ku  
ne wetati bin ji mafê wan û dengda-  
nê hebe. Di destpêkê de vi mafi  
bîdîm ew kesên ku welatîyên wela-  
tên Bakûr in û mercên (şertên wan  
yên dengdanê hene. Ew kes karin  
dengê xwe bîdîm bajardariyê û  
encûmena bajêr.

— Pirsîyara mafê dengdanê nêzi-  
ki dest jê berdanê ye. Piraniyeke  
siyasi li ser vê pêşniyariyê peyna  
ne bûne.

Ew kesê ku ne welatîyên Swêd in,  
nîkarin di hilbijartina parlamentoyê  
de beşdar bînin. Sosyal Demokrat  
û Partiya Çep a Komunistan (VPK)  
mafê dengdanê ji her kesi re xwe-  
stin, lê partiye n burjuwazi li dij  
rawestan. Û hin kes ji di nav van  
partiye n jorin de hebûn, ku li dij  
siyaseta partiye n xwe bûn.

Li gor ditnên Tomas Hammar,  
biyaniyên ku li Swêd dijîn, naxwa-  
zî bîbîb welatîyê Swêd. Ji ber ku

ew çaxa bîbin welatîyê Swêd,  
welatîya welatên xwe wînda dîkin.  
Îro, ne kêmtirî 100.000 kes,  
ew xwediyê welatîyên Swêdê ne.  
Hêvi ew e, ku pêkanîna du wela-  
tîyan e. Ew dibe babeta lêkolîne-  
ke nuh.

— Hinekî dijwar e, ji ber ku Swêdê,  
peymanek bî neh dewletên Şewar-  
dariya Ewrûpayê re daniye: Dan-  
mark, Fransa, Holand, Luksenburg,  
Nerwîj, Bîritanya Mezin, Elmanya  
û Awîstîrya (Nîmsa). Peyman dibêje'  
du welati di navbera welatan de na  
be, lê imkanek heye, ew ji , em dîka-  
rîn duwelatîyê bî welatên ku pey-  
manê imza nekîrîne, wek minak  
Fransa destûr dîde, hinek dewletên  
Afrikayê..

Tomas Hammar dibêje, ku ji me  
kesên swêdî re mafê dengdana par-  
lamentoyê ya heri grîngtîrin e.

— Mîrov destpêke û hinekî bihe-  
jîne: Ew kesên ku bînin hilbijartin,  
ger welatîyê Swêdê ne be ; di be,  
ku di tîkîli û karûbarên der de, prob-  
lem û pingar çê bînin.

Ez bawer im, mafê dengdanê —  
bê ku xwedan — hilbijartin di nav de  
be, dîkare bersîva gelek pîrsan bîde.  
Bî mafê dengdanê mîrov pê dihese,  
ku tesîra wi heye û kesên siyasî da-  
xwazên wi bî cîh tînin. Ew ê, ku bî  
rasti dixwaze bêt hilbijartin, divê  
ew gava pêşîn bavêje û bibe welatîyê  
Swêdê.

Îro, sê parlamenterên biyani di  
parlamentoya Swêdê de hene. Yek  
ji wan welatîyê du (2) welatan e.

**NÛNERIYA BAJARDARIYÊ Û  
ENCUMENA BAJAR ÇAWA JI  
DERVE XWUYA DIKE?**

Hejmara berendamên biyani ji  
hilbijartînek ta hilbijartîneke dîn zê-  
de dibe.

— Ev pêşketîneke gelek normal e.  
Ji ber ku ew demeke dirêj dixwaze,  
ta ku bibe xwedî tecrûbe û bê te ter-  
cîh kîrin.

Di sala 1982 yan de 528 kes ji  
bo encûmana bajardariyê wek enda-  
mên fermî (resmî) hatin hilbijartin.  
2 651 kes berendametîya xwe dani  
bûn. Ji bo encûmena bajar, 54 kes  
ji 630 kesên nûnerên biyaniyan  
hatin hilbijartin.

VPK, partiyeke biçûktîr e, lê gelek  
nûnerên wê hene. Sosyal Demokrat  
ji partiya herî mezîn e. Lê, her wîsa  
berendam û nûnerên partiye n burju-  
wazi ji hene.

Ew kesên ku hatîne hilbijartin  
pergala wan gelek xweş e. Bî rasti  
kê m biyani hene. Endamên Finî  
ji yê n biyani yê n dîn zêdetîr in. Ji  
ber ku Finî, gelekî li hilbijartîne ama-  
de dîbin. Yewnani ji di nav biyani-  
yan de gelek dengê xwe didîm. Lê,  
mîrovên wan gelekî kê m in. He wi-  
ha Yugoslav û Tîrk ji wek wan in.

Dengdana hejmara welatîyên biya-  
ni hinekî ji hilbijartînekê ta hilbijar-  
tînekê dîn bîntîr bûn. Ji 220.000  
welatîyên biyani yê n ku li Swêdê  
bûn, bî kê masî di sê salan de dora  
%25 bûn ku cara pêşîn e, ku dengê  
xwe didîm.


Tomas Hammar, nîzane, ku çawan  
agahdariyên parti yê n siyasî bî kar  
dîhatin.

— Ev karê partiyan e. Ez dîkarim  
hîzîr bîkîm, ku ew ne wek hev xwe  
li tev biyaniyan dîkin. Wan wek  
hilbijêrên û xwe  
bîjmêrîm. Bî rasti deng li hemû par-  
tîyan belav dîbin. Lê, heta niha  
Sosyal Demokrat û VPK pîraniya  
dengî gîrtîne. Guhartînek heye,  
gava mîrov li Swêdê pîr bîmine  
hinekî daxwaza wi/wê ji aliyê bur-  
juwazi ve zê detîr dibe.


Bî tevayi yê n ku berîya 1972  
yan hatîne, komîkên biyani yê n  
mezîntîr in. Niha mafê dengda-  
nê ji komîka Asuriyan re ji heye û  
dê ew di vê hilbijartîne de cîyekî  
grîng bîgîrin.

Cîvakên ( komîkên ) biyani yê n  
ne wek hev, hez û dîlxwestîna wan

# beşdarê hîlbijartîna 15 ê ilonê bibe!



15 Ê Ilonê roja hîlbijartîne ye.




Jindar û Rojna dê hîlbijêrîn.




Partî li derê lokalan pişûlan belav dikin.



Pişûlên hîlbijartîne li lokale hîlbijartîne jî hene.



Jindar û rojna jî bo pişûlên hîlbijartîne zêrê digrîn.



Divê kes nîzanî be ew çawa dengê xwe dide.



Rojna pişûla çatnekirî dike zêrê.



Navê Rojna di lista hîlbijartîne de tê nîvandîn ku wê dengê xwe daye



Loqela hîlbijartîne tê gurtin.



Di gurtina loqelê re dest bi hejmartîna dengên tê krîn.



Rojna û Jindar di TV. de li netîca hîlbijartîne dinêrîn.

ADRESS/NAVNIŞAN:

RISSNELEDEN 55,NB

172 44 SUNDBYBERG/SWEDEN

MASSKORSBAND

